

## Çîroka Oedipusa Kurdî

Çîroka Oedipus Rex a ku Sophokles di B.Z. 400'an de wek nimûneyeke trajedyayê nivîsiye li seranserê cîhanê navdar e. Ev navdarî bi saya serê şîroveya Freud a çîrokê ya bi şêweyekî psîkanalîst hîn berfirehtir bûye ku di lîteraturê de...***Samî Hêzil / R.5***



## Gula Reş û efsûna Xelfetiyê

Her rengekî xwezayê xwedî wateyekê ye. Her rengek bûye sembola hin hestan û derûniyan. Hin ji wan dilê mirov geş dikin, germ dikin, aramiyê didin û dibin sedema xweşiya derûniya mirov. Reş... Rengê şînê û jixwebaweriyê...***Bêrîvan Karatorak / R.11***



## Afganistana 180 sal berê

Beriya 180 salî dema ku leşkerên Îngilîstanê xwe ji Kabîlê ber bi Îslamabadê de vekişandin, di vekişînê de bi hezaran leşkerên îngilîz hatin kuştin. Hêza Îngilîstanê ya bi serokatiya general William Elphinstone xwe ji... ***R.6***

# xwebûn

23-29 TEBAX 2021 HEJMAR:88 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Êrîş li dijî statuya Şengalê bû

Balafirên şer ên Tirkiyeyê di 16'ê tebaxê de li Şengalê maşîna YBŞ'ê bombe kirin. Di êrîşê de Fermandarê YBŞ'ê Seîd Hesen û biraziyê wî Îsa Xwedêda jiyanên xwe ji dest dan. Rojnameger Îbrahîm Êzidî diyar kir ku di roja Serokwezîrê Iraqê Mistefa Kazimî Fermandarê YBŞ'ê ziyaret bikira û li ser statuya Şengalê û peymana 9'ê cotmehê niqaş bikira êrîş pêk hatiye... ***R.3***




## Têkoşîna neteweya bêsînor: Jin

Beriya hefteyekê yanî di 15'ê tebaxê de Afganistan bi plan û hevpeymaneke qirêj a navneteweyî radestî Talîbanê hat kirin. Wekî tê zanîn Talîban tevgereke îslamî ya radîkal e û yekane armanca wî jî anîna pergala şerîatê ye. Roja ku Talîbanê dest danî ser rêveberiya Afganistanê gelek dîmenê trajedîk derketin holê ku gel hewl dida xwe ji xezeba Talîbanê xelas bike. Ew dîmenên trajîk carek din jî nîşanî me da ku civakên girêdayî hêzên derve û ne xwedî hêzên cewherî her tim mehkûmê kaoşê ne û jiyana wan her tim di destê hêzên desthilatdar de ne. Lê derveyî dîmenên trajîk dimenên ku hêviya mirovan zêde dikin jî derdikevin holê. Roja ku ewrên reş xwe li ser Afganistanê pêça, çend jinên wêrek bûn... ***Elif Can Alkan / R.2***



## Dixwazin nijadperestiyê peş bixin

Talîban di 15'ê tebaxê de ket bajarê Kabulê û bi temamî rêveberiya Afganistanê bi dest xist. Têkildarî ketina rêveberiya Afganistanê, nivîskar û rojnameger Faîk Bûlût li ser bandora penaberan a guhertina demografiyê rawestiya û wiha got: "Wê li Tirkiyeyê di aliyê demografiyê de guhertineke mezine pêk bînin. Herî zêde berê xwe didin Anatoliya Navîn. Bi vê yekê dixwazin bingeha Îtîfaqa Cûmhûr xirt bikin. Dîsa li Wanê û Amedê belav dibin. Bi cih dibin. Dikarin li erdnîgariya kurdan di aliyê demografiyê de guhertineke mezin çêbikin. Bi her awayî xuya ye ku dê demografiyê biguherîne. Ya din jî siberojê kes û hikûmeta ku naxwaze îqtîdar bê guhertin û di hilbijartinê de... ***R.7***



# Ev sedsal sedsala gelê kurd e

KCD, DBP û TJA'yê demek dirêj e berê xwe dane nava civakê û bi civakê re xebatên rêxistinkirinê dimeşînin. Di çarçoveya vê pêngavê de li bajar, bajarok û gundan civînan li dar dixin û bi gel re tênê cem hev. Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk wiha got: "Mirovên me biryara xwe dane, dizanin çi dixwazin. Di serî de bi taybetî jî li hemberî tecrîdê nerazîbûnên xwe tînin ziman... ***Hevpeyvîn / Navenda Nûçeyan / R.4***

RIZA UYAR

## Diya min jî wêjevan e... ***R.10***

BAHA AKHAN

## Alegorîya edebî... ***R.9***

## PDK gundan vala dike SMO'yê bi cih dike

Operasyonên Tirkiyeyê yên di 23'yê nîsanê de li Metîna, Avaşîn û Zapê yên Herêma Federe ya Kurdistanê hatin destpêkirin, didome. Tirkiye li qadê, zehmetiyên dijwar dijî. Ji ber vê yekê hêzên taybet ên girêdayî PDK'ê dixe pêşiya xwe û dixwaze ji bo xwe qadên nû veke. Di şerê li herêma Avaşînê de gelek leşkerên TSK'ê hatin kuştin. PDK ji bo pêşiya vê bigire, 70 gundên ji herêma Zaxo bigire heya Bradostan vale kir. Niha jî li van gundan malbatên hêzên çekdar bi cih dikin. Xebatên bicihkirina endamên SMO'yê û malbatên wan ên ku ji Sûriyeyê anîne, yên li cih û warên li Zaxo, Amediyê û Duhokê hatine... ***R.7***



## Lêgerîna edaletê û rûyê faşîzmê

Edalet û faşîzm du têgehên dijî hev in, lewma devera ku edalet lê heye, faşîzm qels dibe, lê devera edalet lê qels be faşîzm zêde dibe. Li gorî diyalektîka Hegelî ev her du têgeh nikarin hev tune bikin, helbet qadê li hev teng dikin û dixwazin hevdu tune bikin, bêguman yek nikare ya din xilas bike. Bingeha têgeha edaletê digihije yewnana kevin ku ji wir heta roja îro gelek caran...***Hisên Çatikkaş / R.6***





## Yado: Teyrê çiyayên Kurdistanê

Yado ango bi navê wî yê di nav gel de Yadîn Paşa di sala 1889'an de, li Dara Hênê ji dayik dibe. Ji eşîra Ziktêyan kurê Mehmudê Ebas e. Dû re malbat ji Dara Hênê ji herêma ku.... ***Ayhan Erkmen / R.12***

## Jîn û jiyanê dikujin

Hêzên serdest çavkaniya jiyana xwe ji tarîtî û kuştinê digirin. Ji ber vê yekê her tim ji tariyê hez dikin û di tariyê de dijîn. Dijminên ronahî û rojê ne. Ji ber ku dema roj hiltê û her der ronî dibe êdî nikarin xwe veşêrin û teşhîr dibin. Dîsa hêza xwe ji kuştinê digirin. Ji ber ku cihê jiyan lê hebe berxwedan û raperîn heye. Azadî heye. Lêgerîn û lêpirsîn heye. Ji bo kes hesab ji wan nepirse û qadê li wan teng neke, wan dikujin. Kesên mafên xwe diparêzin, ji ber ku qada serdestiyê li desthilatdaran teng dike, dibin hedefa êrîşan. Desthilatdar xwezayê talan û wêran dikin. Nexweşxaneyan bombe dikin. Daristanan dişewitînin. Birîndaran û xizmetkarên tenduristiyê qetil dikin. Nexweşxane cih û warên jiyandinê ne. Bijîşk û xizmetkarên tenduristiyê ji bo jiyandina mirovan sond... ***M.Alî Ertaş / R.8***

# Ji Rojava heta Afganistanê neteweya bêsînor: Jin

Elîf Can Alkan

Beriya hefteyekê yanî di 15'ê tebaxê de Afganistan bi plan û hevpeymaneke qirêj a navneteweyî radestî Talîbanê hat kirin. Wekî tê zanîn Talîban tevgereke îslamî ya radîkal e û yekane armanca wî jî anîna pergala şerîatê ye. Roja ku Talîbanê dest danî ser rêveberiya Afganistanê gelek dîmenê trajedîk derketin holê ku gel hewl dida xwe ji xezeba Talîbanê xelas bike. Ew dîmenên trajîk carek din jî nîşanî me da ku civakên girêdayî hêzên derve û ne xwedî hêzên cewherî her tim mehkûmê kaosê ne û jiyana wan her tim di destê hêzên desthilatdar de ne.

Lê derveyî dîmenên trajîk dimenên ku hêviya mirovan zêde dikin jî derdikevin holê.

Roja ku ewrên reş xwe li ser Afganistanê pêça, çend jinên wêrek bûn ronahiya di nav tarîtiyê de, li ber deriyê qesra serokkomariyê bi pankartên destên xwe Talîbanê şermezar kirin. Ew jinên wêrek ku tevî dizanîbûn dê ji aliyê Talîbanê ve bên qetilkirin jî nexwestin serî li hemberî pergala mêran bitewînin, bi wê çalakiya xwe bûn dengê jinên afgan û rêya 'divê civak li dijî pergala hov çi bike' nîşan dan.

Bûyereke din a balkêş jî biryara vegera jineke afgan a bi navê Mehbûba Serac bû. Mehbûba Serac çalakvaneke mafê mirovan e. Bi salan e ji bo mafên jin û zarokan xebatan dike. Serac seroka Navenda Pêşxistina Hunerên Jinên Afgan e. Heta beriya 2 hefteyan ev jina wêrek li DYA'yê bû. Lê wê biryar da ku vegere welatê xwe û li Afganistanê bijî. Mehbûba der barê biryara xwe de wiha got: "Ez jineke afganî me û divê vegerim welatê xwe. Berpirsiyariya min ji bo hemû jin û zarokên ku li wir dijîn heye. Divê ez bi wan re bijîm, ez nikarim dest ji wan berdim û welatê xwe terk bikim."

Ji aliyê din ve jî li hin bajarên Afganistanê ku hê jî Talîban neketiye wan bajaran, jinan ji bo parastinê çek rakirin. Jinên li dijî Talîbanê çek rakirin, diyar kirin ku dê heta dawiyê ji bo maf û axa xwe li ber xwe bidin.

Dîmen û sekna jinên afgan dubare nîşanî me jinan û civakên ku li dijî desthilatdariyê têdikoşin da ku yekane rê berxwedan e.



Wekî tê zanîn li ser rûyê erdê bi sedan netewe hene ku her yek ji wan di nav sînorekî yan jî ernîgariyekê de dijîn. Lê tenê neteweyek heye bê sînor e; ew jî neteweya jinan e. Madem jin neteweyeke bêsînor in, divê li her derê hêza xwe bikin yek û xwedî li destkeftiyan derkevin

**Jinên Rojava**

Di sedsala 21'emîn de mînaka herî şênber ku bi berxwedana xwe bûn îlhama jinên hemû cîhanê jî Şoreşa Rojava ye ku wek Şoreşa Jinan jî tê pênasekirin. Jinên rojavayê Kurdistanê tevî her cureyên êrîşan jî ev zêdetirî 10 sal in pêşengtî ji şoreşê re dikin. Jinên şoreşê bi têkoşîn û rêxistinbûna xwe çeteyên herî hov ên cîhanê DAIŞ'ê têk birin û bûn hêviya hemû jinan. Berxwedana jinên şoreşê kir ku hemû jinên cîhanê xwe li derdora wan bikin yekbeden û şoreşa ednîgariyekê bikin şoreşa hemû jinên cîhanê. Jinên şoreşê ku ji bo hemû jinan bûn îlham û hêvî, di çeperên herî pêş de li dijî çeteyan şer kirin, tev li gelek operasyonên girîng bûn. Gelek jinên di destê DAIŞ'ê de bi taybetî jinên êzidî ku li bazarên koleyan de hatin firotin, rizgarkirin. Jinên şoreşê herêmên xwe ji çeteyan paqij kirin û kincên reş ku sembola zihniyeta qirêj a çeteyan bûn û li ser jinan ferz kiribûn, çirandin. Gelek jinên ku kincên reş ji ser xwe avêtin, bi kincên xwe yên rengareng ku li dijî tarîtiya zihniyeta mêr bû sembola azadiyê, tev li refên berxwedanê bûn. Vê carê ew jinên ku kince tarîtiyê çirandibûn, bûn hêviya jinên wekî xwe.

Hêzên hegemonîk beriya 10 salan senaryoya ku îro li Afganistanê xistin meriyetê, xwestin li Rojava jî pêk bînin. Lê planên hezên hegemonîk ku xwediyê çeteyan in, di serî de bi jinan û bi saya gelên herêmê ku xwe spartin hêzên xwe yên cewherî, têk çû. Hê jî hêzên hegemonîk dixwazin planên xwe pêk bînin lê heta jinên ku pêşengtî ji rojên azad re dikin hebin dê tu carî nikaribin planên xwe pêk bînin. Dê her tim tarîtî bi tîrêjên ronahiyê bê têkbirin.

**Jinên Şengalê**

Yek ji cihên ku bi berxwedana jinan ket dîrokê jî berxwedana kurdên êzidî yên Şengalê ye. Êzidiyên Şengalê di 3'yê Tebaxa 2014'an rastî êrîşa çeteyên DAIŞ'ê hatin ku çeteyan xwestin bi fermana 74'an dînê herî qedîm a li ser rûyê erdê tune bikin. Lê ev fermana 74'an a hêzên tarî, bi saya pêşengiya şervanên jin negihişt meqsedê xwe. Civaka êzidî bi taybetî jî jinên êzidî ku ji aliyê çeteyan ve li bazaran wek kole hatin firotin û hê jî aqûbeta hezaran nayê zanîn, piştî fermana 74'an dest bi rêxistinbûna xwe kirin. Jin ji qada leşkerî heta qada civakî li nav avakirina jiyaneke nû de cihê xwe girtin. Piştî fermanê jinan dît dermanê her tiştî berxwedan û xwebirêxistinkirin e.

Tevî ku li ser fermanê 7 sal derbas bû hê jî hêzên navneteweyî û herêmî dixwazin li Şengalê rêxistinbûna êzidiyan ango ya jinan tune bikin û dîsa wek berê wan mehkûmê desthilatdariyê bikin. Heta ji bo pêkanîna planên xwe di 9'ê Cotmeha 2020'î de, di navbera hikûmeta Iraq û PDK'ê de (ev peyman planeke navneteweyî ye) Peymana Şengalê hat îmzekirin. Li gorî vê peymanê ku bi tu awayî îradeya civaka êzidî bi taybetî ya jinên êzidî li ber çavan nagire, dê hêzên herêmî ku êzidiyan di destê çeteyan de hiştin dîsa vegerin Şengalê. Lê ev peyman bi tu awayî ji aliyê êzidiyan ve nehat qebûlkirin, heta niha jî bi saya berxwedana jinên êzidî û civaka êzidî neketiye meriyetê. Heta çend meh berê artêşa Iraqê xwest bi zorê bikeve Şengalê lê jinên êzidî yên wêrek derketin pêş artêşê û nehiştin artêşa Iraqê lingên xwe biavêje axa wan a pîroz. Ev wêrektiya jinan ku artêşê neçarî vekişandinê kir, bû dîrok.

Ji roja fermanê heta îro jinên êzidî diyar dikin ku ger yek ji wan jî li Şengalê bimîne dê li ber xwe bidin û xwedî li destkeftiyên xwe yên ku bi berdelên mezin bi dest xistine, biparêzin.

**Neteweya jinan**

Beriya 10 salan jinên şoreşê û êzidî û îro jî jinên afgan, careke nîşanî me jinan û hemû cîhanê dan ku li cihekî rengê jinan bi taybetî jî berxwedana jinan hebe, li wê derê her tim jiyan heye, hêvî heye û rojên azad hene. Li cihekî jin xwe bi berxwedanê bixemilînin li wê dere her tim tarîtî mehkûmê têkçûyînê ye.

Wekî tê zanîn li ser rûyê erdê bi sedan netewe hene ku her yek ji wan di nav sînorekî an jî ernîgariyekê de dijîn. Lê tenê neteweyek heye bê sînor e; ew jî neteweya jinan e. Jin li ser rûyê erdê neteweyeke bêsînor in, ji ber ku li her derê rastî heman astengî û êrîşan tê. Heta her li ku dibe bila bibe berxwedan û destkeftiya wan bandorê li hev dike, ji hev re dibin îlham. Madem jin neteweyeke bêsînor in, divê li her derê hêza xwe bikin yek û xwedî li destkeftiyên hemû jinan derkevin. Niha roj ev roj e ku jin erkên xwe ya neteweyî pêk bînin!

Her wiha divê tu carî neyê jibîrkirin dawiya dawî di encama her berxwedana jinan de serkeftinek heye. Dîrok bi mînakên bi vî rengî tijî ne. Destkeftiyên jinan a îro hemû bi saya jinên beriya xwe ku li dijî desthilatdarên herî hov li ber xwe dan û di oxira wê de canê xwe dan, hatine bidestxistin. Piştî çûyîna her jinên berxwedêr jin hîn zêdetir bi hêz bûn. Yanî ji roja serî heta îro di hemû berxwedan, şoreş û destkeftiyan de reng û dirûvê hemû jinên cîhanê heye.









## Siyaseta Barzanî ya dijî jinan şermezar kirin

Yekitiya Gelên Meksîkayê bi peyamekî piştgiriya xwe ji bo endamên RJAK'ê yên ji aliyê PDK'ê ve dîl hatine girtin, ragihand û binçavkirina çalakvanên jin şermezar kir. Di peyamê de hat diyarkirin ku ew wek Yekitiya Gelên Meksîkayê li gele têkoşîna Tevgera Jinên Kurdistanê ne, li dijî her êrîşek li ser jinên kurd û gelê kurd dengê xwe bilind dikin û wiha hat gotin: "Em siyaseta Hikûmeta Kurdistana Iraqê ya bi berpirsyariya Barzanî ku bi hevkariya Amerîka û Tirkiyeyê dijî jinên ji bo jiyanê têdikoşin şermezar û red dikin. Divê were zanîn, em ê hevalên xwe bi tenê nehêlin û têkoşîna wan têkoşîna me ye." ***MEKSÎKA***



## 'Em jinên Efrînê bêyî çandinî nikarin bijîn'

Jinên Efrînê yên ji warê xwe koçber bûne û li kantona Şehbayê bi cih bûne, malên rûxandî û çadirên koçberiyê bi çandiniyê dixemilînin. Jinên Efrînê bi çandina kulîlkan û sebzeyan pêşiya malên xwe veguherandine cihê jiyanê. Yek ji jinên Efrînê ku pêşiya mala xwe bihûşteke biçûk ji çandiniyê çêkiriye, Meziyet Mihemed Osman e ku ji navçeya Reco ya Efrînê koçberî gundê Til Şeîr a Şehbayê bûye. Meziyeta hem bi çandinê debara xwe dike hem jî xwedî li çanda xwe ya resen derdikeve, li warê koçberiyê pêşiya mala xwe ya hilweşayî baxçeyek çêkiriye, wiha dibêje: "Em jinên Efrînê bê çandinî nikarin bijîn". ***ŞEHBA***




## Tundiya li ser jinan ji sedî 50 zêde bûye

Li başûrê Kurdistanê her çiqas gelek rêveberî û saziyên taybet li dijî tundiya li ser jinan hatibin avakirin jî wan nekarîne pêşî li tundiyê bigirin. Tenê di nava 6 mehên destpêkê yên îsal de 80 jin an hatin qetilkirin an xwe kuştine yan jî xwe şewitandin. Li navçeya Koye ya girêdayî Hewlêrê îsal li gorî salên din rêjeya tundiya li ser jinan ji sedî 50 zêde bûye. Sazî û rêxistinên jinan gotin ku hikûmet bi qasî ku pêwîst bû ji bo jiholêrakirina tundiyê li gel rêxistinên jinan nebûye alîkar û gotin ku di ser de jî hikûmet li dijî rêxistinan û fikrên wan ên cuda ye û nahêle ew erkê xwe yê pêwîst yê şiyarkirina civakê pêk bînin. ***KOYE***

# Tirkiye êrîşê statuya Şengalê dike

Rêveberên Şengalê diyar kirin ku êrîşên li dijî Şengalê bi plan û zanebûn pêk hatine. Qeymeqamê Şengalê Fehed Hamid diyar kir ku rola Seîd Hesen a di tunekirina DAIŞ'ê de gelek zêde bû û ji hikumeta Iraqê xwest êrîş bê ronîkirin

Navenda Nûçeyan

Balafirên şer ên Tirkiyeyê roja 16'ê tebaxê saet di 12.00'an de li sûka kevn a Şengalê wesayîtek YBŞ'ê bombebaran kir. Di êrîşê de Fermandarê YBŞ'ê Seîd Hesen û biraziyê wî Îsa Xwedêda jiyana xwe ji dest dan. Fermandariya YBŞ'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di êrîşê de Fermandarê YBŞ'ê Seîd Hesen, birazîyê wî û şervanê YBŞ'ê Îsa Xwedêda şehîd bûne û 3 sîvîlên bi navê Medya Qasim Simo, Şamir Abbas Berces, Mîrza Alî jî birîndar bûne. Cenazeyên Fermandarê YBŞ'ê Seîd Hesen û biraziyê wî Îsa Xwedêda li Şehîdgeha Şehîd Dilgeş û Şehîd Berxwedan bi merasîmek girseyî spartin axê.

Balkêş e roja ku Serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazimî dixwest serdana Şengalê bike, balafirên şer ên Tirkiyeyê maşîneya Fermandarê YBŞ'ê kir hedef. Beriya hevdîtin bên kirin êrîş pêk hat.

Der barê mijarê de Qaymeqamê Şengalê Fehed Hamid destnîşan kir ku rola Saîd Hesen a di tunekirina DAIŞ'ê û parastina civaka êzidiyan de pir zêde bû û wiha got: "Ji bo yekitiya gelê êzidî ew jî wek Mam Zekî, Zerdeşt û Mam Beşîr hertim di nava xebatan de bû. Di demeke ku Serokwezîrek Iraqê piştî 40 salan cara yekem tê Şengalê de, hedefgirtina Seîd Hesen cihê gumanê ye û ne ji rêzê ye. Beriya êrîş pêk were Saîd Hesen bi hin berpirsên Iraqê re di hevdîtinek giring de bû, li ser rewşa Şengalê diaxivîn. Piştî ew civîn bi dawî bû, Seîd ji bo ku bi Kazimî re hevdîtinê pêk bîne, berê xwe da navenda Şengalê.

Balafirên şer ên Tirkiyeyê di 17'ê tebaxê de li nexweşxaneya gundê Sikêniyê ya Şengalê xistin. Xelkê gund ê xwestin bi hawara birîndaran ve biçin, balafiran vê carê dîsa bombe kir. Di encamê de gelek kes birîndar bûn û jiyana xwe ji dest dan.

Çalakvan û rewşenbîrên Silêmaniyê li dijî êrîşên Tirkiyeyê yên li ser Şengalê çalakiyek nerazîbûnê li dar xistin. Di çalakiyê de bang li hikûmeta Iraqê û civaka navnetewî kirin ku pêşî li êrîşên Tirkiyeyê yên li ser gelê kurd bigirin.




**Dê 9'ê cotmehê niqaş kiribûna**

Rojnameger Îbrahîm Êzidî anî ziman ku dê Peymana 9'ê cotmehê bihata niqaşkirin û bal kişand ser mijarên di hevdîtinê de bihatina nîqaşkirin û wiha got: "Dê bi Mistefa Kazimî re mijarên pir girîng bihatina niqaşkirin. Hebûn û tunebûna Rêveberiya Xweser dê bihata niqaşkirin. Berê Peymana 9'ê cotmehê hatibû îmzekirin. Di van hevdîtinan de mecbûr bû hin xal bên guhertin an jî peymana 9'ê cotmehê bê îptalkirin. Ji bo ku di aliyê qanûnî de Rêveberiya Xweser û hêzên wê yên parastinê bên qebûlkirin. Mistefa Kazimî piştî serdana Koço dê serdana Rêveberiya Xweser a Şengalê bikira. Dema Serokwezîrê Iraqê bi kijan saziyê re rûnê tê wê wateyê ku ew sazî fermî ye."

## Hesen 75 roj in di destê PDK'ê de ye

Hêzên PDK`ê nûnerê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Cîhad Hesen û endamên têkiliyên PYD'ê Mistefa Xelîl Osman û Mistefa Ezîz Mistê ku ji bo pêşwazîkirina mêvanên xwe, çûbûn balafirgeha Hewlêrê, di 10`ê hezîranê de, li Hewlêrê revandin.
PDK'ê di 29`ê tîrmehê de du Endamên Têkiliyan ên PYD`ê piştî 50 rojî serbest berdan. Lê nûnerê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li Hewlêrê Cîhad Hesen hîna revandî ye û rewşa wî ya tenduristî xirab e. Heta ev hejmara rojnameyê çap bû 75 roj derbas bûn. Lê hêj rayedarên PDK`ê sedemên revandinê ji PYD`ê û Rêveberiya Xweser re diyar nekirine. ***AMED***

## Kurd ji bo Şengalê daketin qadan

Li gelek bajarên Ewropayê bi deh hezaran kurd û dostên wan ji bo şermezarkirina êrişên li ser Şengalê daketin qadan. Bi hezaran kurd li bajarên Koln, Essen, Kîel, Hannover, Darmstadt ên Almanyayê, bajarê Bassel ê Swêdê, bajarê Lûzernê, bajarê Parîs, Marîgnan, Bordeaûx û Marsîlya yên Fransayê daketin qadan û êrîşên Tirkiyeyê yên li dijî Şengalê şermezar kirin. Bi fransî, almanî, swêdî û gelek zimanên din daxuyanî dan. Bi hezaran kesên daketin qadan dirûşmeyên 'Bijî berxwedana Şengalê', 'Qatil-Terorîst Erdogan' û 'Şehîd namirin' berz kirin. Şêniyên Kobanê, nûnerên Rêveberiya Xweser, saziyên civaka sivîl, partiyên siyasî li qada Şehîd Egîd a Kobanê kom bûn û meşiyan Qada Jina Azad. Li Hesekê jî bi heman armancê şênî li Çerxerêya Xiwêran a Hesekê kom bûn. Beşdarên meşê heta baregeha Koalîsyona Navneteweyî meşiyan. Li ser navê rêveberiya Kantona Hesekê endama rêveber Zêneb Efrîn êrîş şermezar kir û diyar kir ku dê li dijî îxanetê bisekinin. ***AMED***



# Dem dema azadiyê ye

Navenda Nûçeyan

Kampanyaya 'Dem Dema Azadiyê ye' li gelek bajar û navçeyên Kurdistanê didome. Gel eleqeyek zêde nîşanî kampanyayê dide. Vê hefteyê jî xebatên kampanyayê li navçeya Çelê ya Colemêrgê, navçeyên Elkê û Sîlopiya yên Şirnexê û Bajarê Sêrtê berdewam kirin.

Rêxistina HDP'ê ya Şirnexê, di çarçoveya kampanyaya 'Dem Dema Azadiyê ye" de li Parka Ahmet Kaya ya navçeya Silopiya Şirnexê civîna gel li dar xist. Komê di civînê de pankarta 'Tekoşîna jinê wê faşizmê têk bibe, azadiyê bilind bike' daliqandin. Dayikên Aştiyê jî dovîzên 'Tecrîd sûcê mirovahiyê ye', 'Bibe dengê girtîgehan' û 'Bijî berxwedana zindanan' bilind kirin.

Li Sêrtê jî endam û rêveberên KCD, TJA, DBP û HDP'ê di çarçoveya 'Dem Dema Azadiyê ye' de civînên gel li dar xistin. Heyeta ku Hevseroka Giştî ya DBP'ê Salîha Aydenîz û Hevserokê Giştî yê HDP'ê Mîthat Sancar di nav de esnaf ziyaret kirin û li avahiya Rêxistina HDP'ê ya Bajêr bernameyek li dar xist.

Dîsa heyeta ku parlamenterên HDP'ê, aktîvîstên TJA û Meclisa Dayikên Aştiyê di nav de ne, di çarçoveya kampanyaya 'Dem Dema Azadiyê ye' de li Elkê gel û esnaf ziyaret kirin. Gelê Elkê heyet bi dirûşmeya 'Bijî berxwedana zîndanan' û coşek mezin pêşwazî kir.

# Mizgeft kirin qereqol

Li gelek bajarên Kurdistanê yên wekî Amed, Riha, Mêrdîn, Êlih û Şirnexê, Şîrketa Anonîm a Belavkirina Ceyranê ya Dîcleyê (DEDAŞ) ceyranê bi ser welatiyan de qut dike û wan ceza dike. Ji ber ceyran bi ser welatiyan de tê qutkirin, welatî bertekên xwe nîşan didin. Li Rihayê piştî welatiyan DEDAŞ şermez kir, leşkeran 18 kes binçav kiribûn. Niha jî li gundê Zorava leşker ji bo DEDAŞ'ê biparêze, mizgefta gund kirin qereqol.

Li gorî nûçeya Ajansa Mezopotamyayê (MA), li gundê Zorava yê navçeya Nisêbînê piştî DEDAŞ'ê ceyrana gund qut kir, leşker ji bo DEDAŞ'ê biparêze li mizgefta gund bi cih bû. DEDAŞ'ê bi hinceta deynê xwe nedane ceyrana gundiyan birî. Li gundê Zorava 4 hezar donim zeviyên çandiniyê hene. DEDAŞ'ê ji her cotkarekî re di navbera 600 hezar û 2 milyon lîre faturayên ceyranê birî. Li gorî fatûrayên DEDAŞ'ê bi komî 20 mîlyon lîre deynê cotkaran heye. Cenderme û cerdevanên ji bo bikaranîna ceyranê ya cotkaran asteng bikin bi daxwaza DEDAŞ'ê li gund bi cih bûn, mizgeft û mala şînê ya gund vegerandin qereqolê.

Cenderme û cerdevan bi şev û roj in li mizgeft û mala şînê yên gund nobetê digirin, trafoyan kontrol dikin. Cenderme şûna wesayîtên eskerî, serwîsên dibistanan ên ku ser plakeyên wan digirin, dixin xizmeta xwe. Ji bo ku mizgeft vegerandine mizgeftê gundî nikarin biçin nimêjê jî bikin. ***MÊRDÎN***



## KESK'î dimeşin Enqereyê

Konfederasyona Sendîkayên Kedkarên Cemaweriyê (KESK) li dijî daxwaza hikûmetê ya di hevdîtinên Girêbesta Komkarî (TÎS) de bi dirûşmeya 'Ji bo peymana komî ya bi grev, demokratîk û jiyaneke mirovî' biryar girt ku ji Edîrneyê û Êlihê bimeşin Enqereyê. Kedkarên Cemaweriyê ji Êlihê û Edîrneyê meşiyan Enqereyê. Baskê Edîrneyê ji Stenbol, Kocaelî û Boruyê re derbasî Enqereyê bûn. ***AMED***

# Daristanên li Kurdistanê dişewitînin û temaşe dikin

Di meha tebaxê de li gelek bajar û navçeyên Kurdistanê agir bi daristanan ket. Li navçeyên Şemzînan û Geverê yên Colemêrgê, navçeya Mîdyadê ya Mêrdînê, navçeya Elkê ya Şirnexê, Çiyayê Cûdî yê Şirnexê û navçeya Hozat a Dêrsimê agir bi daristanan ket. Çavkaniyên herêmî diyar dikin ku piştî operasyonên leşkerî an jî topbaranê agir bi daristanê dikeve. Welatiyên ku dixwazin şewata daristanan vemirînin jî ji aliyê leşkeran ve tên astengkirin.

Li qada daristanê ya li nêzî çiyayê Gomanê ku nêzî gundê Nêrkole yê bi ser navçeya Şemzanînê ve ye agir bi daristanê ketiye û daristan dişewite. Di 17'ê tebaxê de agir bi daristanê ket. Leşker nahêlin ku gundî jî mudaxale bikin. Serokê Yekitiya Odeya Esnaf û Sinetkaran a Colemêrgê Muharrem Tekîn li ser medyaya sanal banga vemirandina şewatê li saziyên rayedar kir.

Li gundê Batê yê navçeya Midyada Mêrdînê agir bi daristanê ket. Piştî gundiyan mudaxale kirin şewat vemirandin. Şewatê bandor li 50 donim erdî kir.

Li gundê Setkarê yê girêdayî navçeya Elkê ya Şirnexê, ji ber gulebarana leşkeran agir bi daristanê ket.

Li Çiyayê Cûdî yê Şirnexê jî agir bi daristanê ket. Ji ber ku leşker destûrê nadin welatiyan, agirê bi daristanê ketiye belav dibe.

Li navçeya Hozanê ya Dêrsimê jî piştî operasyona leşkerî agir bi daristanê ket. Şewata daristanê didome. ***AMED***

## Di hefteyekê de 85 kes binçav kirin

Di vê hefteyê de polîs û eskeran bi ser gelek malan de girtin û bi giştî 85 kes binçav kirin. Li gundê Dêlezî yê navçeya Geverê ya Colemêrgê leşkeran bi ser malan de girtin û 6 kes binçav kirin. Li Rihayê leşkeran di 18'ê tebaxê de 11 cotkar binçav kirin. Li navçeya Sîlopiya ya Şirnexê polîsan di 14'ê tebaxê de 5 kes binçav kirin. Li navend û navçeyên Mêrdînê, polîsan 5 kes binçav kirin.
Li Amedê jî polîsan bi ser 104 malan de girt û 58 kesan binçav kirin. ***AMED***

## GELÊ ME JI HER DEMÊ BÊHTIR BI BIRYAR E

# Ev sedsal sedsala gelê kurd e

Navenda Nûçeyan

*KCD, DBP û TJA'yê demek dirêj e berê xwe dane nava civakê û bi civakê re xebatên rêxistinkirinê dimeşînin. Di çarçoveya vê pêngavê de li bajar, bajarok û gundan civînan li dar dixin û bi gel re têne cem hev. Nûnerên partî û rêxistinan bi gel re hevdîtinan dikin, fikir, pêşniyaz û nêrînên xwe bi gel re parve dikin û pêşniyaz û nêrînên gel digirin. Têkildarî xebatên rêxistinkirinê Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û Parlementerê HDP'ê yê Agiriyê Berdan Ozturk pirsên Rojnameya me bersivand.*

**Demek e we dest bi xebatên 'Li dijî faşîzmê em xwe bi rêxistin dikin' kiriye. Hûn dikarin hinekî behsa hedef û armanca vê xebatê bikin?**

Li dijî faşîzmê em xwe birêxistin dikin. Weke KCD, DBP û TJA û hwd. ev salek e xebatên me berdewam dikin. Armanca vê çi ye? Gel, sazî û partiyên me di pêvajoyeke giran re derbas dibin. Li gorî plana çokdanînê ku di sala 2014'an de hatibû amadekirin, li Kurdistanê, li ser her beşên civakê êrîş çêbûn. Ji ber vê yekê têkiliyên me jî bi gelê me re germ nebû. Îro ku em li dinêrin be tenê li Bakur li her çar parçeyên Kurdistanê jî di pêşengiya Tirkiyeyê de li ser pêşereoja gelê kurd leyîstokên mezin hene. Yanî ji bo ku gelê kurd nebe xwedî statu û îrade em baş dizanin ku dewleta tirk li gor plansaziya xwe xebatan dide meşandin, êrîşan dike û dagirkirinê dayê pêşiya xwe. Îro jî başûrê Kurdistanê dagir dike. Ji ber vê yekê li gund, bajar, bajarokan di vê pêvajoya girîng û dîrokî de em him nêrînên xwe bi gelê xwe re parve dikin him jî nêrînên wan, pêşniyazên wan hebin em digirin. Ji bo ku em di pêşerojê de têkoşîna xwe xurttir bikin.

**Heta niha we xebatên bi çi rengî meşandin? Di van xebatan de ruh û wêneyekî çawa derket holê?**

Bi rastî jî zilm û zexteke pir mezin li gelê me hat kirin û hê jî tê kirin. Tişta herî girîng ew e ku gelê me ewqas zehmetî jî kişandiye dîsa xwedî li doza xwe jî derdikeve û li ber xwe dide. Baweriya gelê me duh çiqas be îro sed qatî zêdetir xurt bûye. Baweriya gelê me bi vê têkoşîna doza xwe, ji bo azadiya xwe pir xurt e. Ji ber vê ew zilm û zexta ku hat kirin û ew hesabê dewletê cihê xwe negirt. Gelê ku em dibînin, mirovên me yên ku em dibînin bi biryar in. Biryara xwe dane, çi dixwazin dizanin. Di serî de bi taybetî jî li hemberî tecrîdê nerazîbûnên xwe parve dikin. Hetanî ev tecrîd berdewam bike jî tu çareserî li Tirkiye û Rojhilata Navîn çênabe. Kurd jî azad nabin.

**Aliyê rêxistinî, ruh û xwedîderketina gel a li pêngav û pêvajoyê di çi rewşê de ye? Beşdarbûn, coş û kelecana gel û pêşwazîkirina gel a vê pêvajoyê di çi astê de ye?**

Coş û kelecanek pir mezin bi gel re heye. Bi dîtina me jî pir kêfxweş bûn. Moralê wan gelekî xurt bû. Em wê biryardarî û moralê wan dibînin bi rastî em jî bi hêz û bi moral dibin. Eleqeyeke mezin hebû. Bîr û baweriya gelê me jî xurt e. Armanca wê plansaziya dewlêtê ew bû ku gelê me bê hêvî bihêle, bê îrade bike. Em li van a tevahî dinêrin yanî ev şeş salên dawî ku em lê dinêrin tu encam negirtine. Bi rastî jî gelê me ji duh xurtir e û xwe bi rêxistin kiriye.

**Heta niha hûn li çend bajaran geriyan û bi gel re hevdîtinên we çawa derbas dibin? Daxwazên gel çi ne. Hêvî û bendewariya gel çi ye?**

Em li gelek bajarên Kurdistanê geriyan. Lê em hîn neçûne bajarên Kurdistanê yên mîna Riha, Dîlok, Semsûr, li aliyê Serhedê jî bajarên Mûş, Erzirom, Erdexan, Qers û Îdirê. Weke din em li bajar, bajarok û hema bêje hemû gundan geriyan.

Herî dawî em li herêma Colemêrgê bûn. Sînor hatine girtin. Bazirganiya gelê me bi taybetî jî li ser sînoran dimeşe. Lê sînor tev hatine girtin, nahêlin gel ticaretê jî bike. Yanî ji hêla aboriyê ve jî zexteke mezin heye. Bi nanê gelê me jî dileyizin. Lê dîsa jî ku em lê dinêrin ev jî ne xema gel e. Gelê me rastî jî tiştekî dibîne. Yanî hetanî ku azad nebe ev zilm jî wê dewam bike, xeynî azadiyê tu çare tune ye. Niyeta dewleta tirk tê zanîn. Dewleta tirk dixwaze gelê me bike xulam. Ev ne tespît û gotinên min in, ev gotin û tespîtên gel bi xwe ne. Dibêjin em vê qebûl nakin. Ji bo jiyaneke bi rûmet çi bikeve ser milê me hetanî îro me kiriye em ê ji niha û şûn ve jî bikin. Yanî nêrînên wan ev e.

Mijara herî sereke ku gelê me gelek caran tîne ziman û nerazîbûn û bertekên tund nîşan dide tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Birêz Ocalan e. Ev tecrîd li tevahiya Tirkiyeyê belav bûye. Ev rejîma ku îro xwe li Tirkiyeyê saz dike, hetanî berdewam bike belkî azadiya me hinekî dereng bikeve lê belê demokrasî nayê Tirkiyeyê jî. Wê çaxê bila gelê Tirkiyeyê jî Tirkiyeyeke demokratîk ji bîr bike. Ji ber vê yekê divê ji bo azadiya fîzîkî ya birêz Ocalan her kes rol û misyona xwe bilîze û ew şert û merc bên avakirinê.

**Hûn di vê gera xwe de bêhtir çi diaxivin. Mijara sereke çi ye? Daxwaza gel a sereke çi ye?**

Mijara me ya yekemîn tecrîd e. Îro pirsgirêka gelê kurd, li Tirkiyeyê pirsgirêka herî girîng e. Hetanî ev pirsgirêk çareser nebe pirsgirêkên heyî jî dê çareser nabin, kûrtir bibin. Pirsgirêka gelê kurd wê çawa çareser bibe? Rê û rêbazên wî gelê me jî baş dizane, tevahiya gelên li Tirkiyeyê jî vê yekê baş dizanin. Yek muhatabê vê pirsgirêkê heye ew jî birêz Ocalan e. Ne tenê îro li bakurê Kurdistanê li Rojhilata Navîn û her çar parçeyên Kurdistanê jî yê ku bandor çêbike birêz Ocalan e. Mijara me ya duyemîn jî yekitiya neteweyî ye. Li her çar parçeyên Kurdistanê leyîstokên dewletê hene. Planên xwe niha li başûrê Kurdistanê dimeşîne. Îro li Başûr PKK'ê ji xwe re wekî hincet nîşan didin. Li başûrê Kurdistanê gelê me bedelên pir giran daye. Gelek însanên me hatine qetilkirin. Bi Enfalê, dîsa li Helepçeyê bi destê Sedam gelek pêşmerge şehîd ketin. Gelek însanên me ji bakurê Kurdistanê çûn li hember rejîma Sedam li ber xwe dan. Gelek şehadet û gazî jî çêbûn. Ev ji bo çi bû? Ne ji bo serkeftin û azadiya partiyekê bû. Ji bo ku li ser axa xwe jiyaneke azad bê jiyîn ev berdêl hatin dayîn. Îro Tayyîp Erdogan û Devlet Bahçelî sed qatî ji Sedam xerabtir in. Nêrîn û nêzikatiyên wan ên li hember gelê kurd sed qatî ji yên Sedam xirabtir in. Sedam li başûrê Kurdistanê zilm dikir, lê dewleta AKP-MHP'ê ne tenê li bakurê Kurdistanê li Başûr jî li Rojava jî êrîşên dagirkeriyê dike.


Ev sedsal sedsala gelê kurd e. Ji bo ku ev bibe sedsala gelê kurd divê kurd yekitiya xwe ya neteweyî ava bikin. Ev rih û hişmendî jî heye. Ev hişmendiya çaxa ku Efrîn hat dagirkirin derket holê. Li Silêmanî û Hewlêrê gelê me Tirkiyeyê boykot kir. Ev seknek e. Tu xebat nehatibû meşandinê lê gel bi biryara xwe malên ku ji Tirkiyeyê dihatin Başûr nedistendin, boykot dikirin. Vê seknê divê em xurtir bikin. Dewleta tirk îro dixwaze di nav partiyan de dijberiyê pêş bixe, hêza gelê me parçe parçeyî bike û wan tune bike. Îro vê leyîstoka xwe li Başûr dide meşandin. Ji bo ku ev plan vala bên derxistin divê gelê me bi xwe înisiyatîfê bigire. Divê ev li benda partî û saziyekî jî neyê hiştin. Di vir de yê înisiyatîfê hilde gelê me ye. Bi taybetî jî gelê me yê Başûr. Çimkî leyîstokên qirêj îro li Başûr xistine meriyetê.

**Di van xebatan de astengiyên li pêş we çi ne. Di aliyê hiqûqî, siyasî û ewlehiyê de astengiyên çawa derdikevin pêş we?**

Ev demek e dirêj e ku dewlet ji me re astengiyan derdixe. Nahêle ku em û gel herin cem hevûdu. Em biçin ku derê heta diçin gundan jî me dişopînin. Bi vê yekê dixwazin gel bitirsînin û em û gel ji hev qut bikin. Yanî gel bitirse û bi me re tu hevdîtinan pêk neyîne. Armanca wan ev e. Herî dawî li Colemêrgê gundên ku em diçûn jî dişopandin, dihatin digotin em ji bo ewlehiya we li vir in. Ev ne rast e. Vê jî encam negirt. Cihê ku em diçûn hevdîtinên me jî xurt derbas dibûn, gelê me jî ew dîtin, yanî dîtin ku çiqasî neçar mane, du sazî hatine (KCD û DBP û hevserokên wan) ewqas ditirsin ku hetanî gundan wan dişopînin. Armanc ev e, ev her tim jî hebûn. Di vê pêvajoyê de jî ev berdewam dike. Ew tirsa wan jî lewazbûna wan nîşan dide. Yanî hatina wan û nehatina wan ji xebatên me re tu astengî nabe. Hîn bêhtir xurtir dike.

**Ji bo demên pêş xebat, plan û bernameyên we çi ne? Hûn ê xebatên bi çi rengî bimeşînin?**

Em ê van xebatên xwe yên ku niha dimeşînin bidomînin. Hetanî ku em li hemû bajarên Kurdistanê bigerin. Li dijî faşîzmê em ê xwe birêxistin bikin. Her çiqasî bîr û baweriya me xurt be jî em çiqas fedakar bin jî ku em bê rêxistin bin em nikarin tu encamê bigirin. Ji ber vê yekê êrişên herî mezin jî li ser rêxistina me çêbûn. Divê em xwe di her milî de bi rêxistin bikin. Bajarên ku em neçûne zêde nemane. Em ê li wan bajaran jî bigerin û hevdîtinên xwe yên bi gel re bidomînin. Piştî vê em ê bernameyeke nû deynin pêşiya xwe. Min di serî de jî got hinek pêşniyarên gel jî hene, fikrên xwe jî bi me re parve kirin. Li gor wan pêşniyazan jî em ê wek KCD û DBP wan pêşniyazan têxin bernameya xwe û xebatên xwe bidomînin.




Mirovên me biryara xwe dane, dizanin çi dixwazin. Di serî de bi taybetî jî li hemberî tecrîdê nerazîbûnên xwe tînin ziman. Hetanî ev tecrîd berdewam bike tu çareserî li Tirkiye û Rojhilata Navîn çênabe, kurd jî azad nabin

### Berdan Ozturk kî ye?



Berdan Ozturk di 1'ê Gulana 1980'î de li navçeya Dutaxê ya Agiriyê ji dayik bû. Navê dayika wî Cemîle, navê bavê wî Cemîl e. Li Beşa Hiqûqê ya Zanîngeha Marmarayê xwend û parêzerî kir. Di qada Hiqûqa Bazirganiyê û Tahkîm a Navdewletî ya Zanîngeha Londrayê lisansa bilind kir. Demekê parêzerî kir. Di ÎHD'ê û MEYA-DER'ê de xebat kir. Bi îngilîzî zane û di hilbijartina 7'ê Hezîrana 2015'an de bû parlamentere HDP'ê yê Agiriyê û hem jî Hevserokê KCD'ê ye.

# Di şopa dîrokê de Mestûre Erdelan

Muqades Agirî

Di gelek civakan de, di gelek qadên jiyanê yên zanistî de, her çiqasî pêşî li ber pêşketina jinê hatibe girtin jî dîrok nîşanî me dide ku jin, heke xwedî derfet bin çiqas hunerên bedew derdixin holê. Wekî her qadên zanistî, di wêjeyê de jî jin, bi pênûsa xwe, wekî deryayekê diherikin li ser rûpelan. Meriv dikare bibêje ku jin, hestên xwe yên kûr û hestên xwe yên nazenîn dikin yek û hunerên nemir li pey xwe dihêlin. Yek ji van jinên jêhatî, serketî û bibandor Mestûre Erdelan e ku hem dîroknas, hem jî helbestvaneke gewre ye ku di nav Edebiyata Klasîk a Kurdî de cihê xwe girtiye.



**Mestûre Erdelan (1805-1847)**

Mah Şeref Xanima Kurdistanî ango Mestûre Erdelan, helbestvan, nivîskar û dîroknasa Kurd e. Di sala 1805'an (li gor hin lêkolîneran di sala 1804'an) de li bajarê Sineyê ji dayik bûye. Bavê wê Ebûl Hesen Beg ji malbata Qadirî bû. Malbata Qadirî li mîrgeha Erdelanê malbatek xuyanî û ronakbîr bû ku bi huner, zanist û dîrokê ve eleqedar dibûn. Bapîrê wê rêveberê xezîneyê (darayî) yê mîrektiya Erdelanê bû. Dêya wê ji malbata wezîrên bajarê Sineyê bû. Ango Mestûre Xanim ji malbateke desthilatdar bû. Mestûre Erdelan zimanê kurdî, farsî û erebî li gel bavê xwe Ebu El Hesen Begê Qadirî hîn dibe. Hê di zarokatiya xwe de, eleqeya wê ya ji bo xwendin û nivîsandinê hebû. Piştî ku digihîje temenê salên perwerdeyê bi piştgiriya bavê xwe, dest bi xwendinê dike. Lewra di wê serdemê de xwendin ji bo jinan ne tiştekî hêsan bû û ne jî pêwîst bû. Lê ji ber bavê wê mirovekî zana bû keça xwe dide xwendin. Mestûre di pêvajoya jiyana xwe ya perwerdeyê de pir zîrek bû. Zimanên farsî û erebî jî gelek baş dizanibû. Helbestên xwe bi zimanê kurdî û farisî nivisandiye. Mestûre Xanimê, piraniya helbestên xwe bi zaraveyê kurdî ya goranî nivîsandine. Her wiha bi zimanê farisî û zaraveyê soranî jî helbestên wê hene. Tê gotin ku gelek helbestên xwe jî, bi zaravayê kurmancî nivîsîne, lê mixabin helbestên wê yên bi zaravayên kurmancî heya roja me ya îro nehatine. Her wiha wekî dîroknaseke jin jî tê zanîn. Ew di Rojhilata Navîn de weke dîroknasa ewil a jin tê zanîn. Bi taybetmendiyên xwe, bala zanyarên biyanî jî dikişîne. Ji ber kesayeta xwe ya zana, gelek helbestvan û nivîskaran di berhemên xwe de qala wê jina bi nav û deng kirine. Ew ji hêla helbestvanên navdar ên mîna Mewlewî ve hate hezkirin û pesnê wê hat dayîn. Nav û berhemên Mestûre Xanimê di nav edebiyata kurdî ya klasîk de cih digire. Her wiha gelek nivîskar û helbestvan ji vê jina zana îlham girtine.

Dîwana helbestên wê, 'Dîwanî Mah Şeref Xanima Kurdistanî'cara yekem ji aliyê Hecî Şêx Yehya Marifetiyê Kurdistanî, berpirsê dîwana Mearifa Kurdistanê ya wê demê, di sala 1925'an de li Tehranê hatiye weşandin, nêzîkî du hezar malikên helbestan hildigire. Mestûre Erdelan digel helbestvaniyê, wek dîroknivîsekê jî pirtûkek bi navê 'Dîroka Erdelan' nivîsiye. Ev berhem di sala 1946'an de li Sineyê ji aliyê zanyarê kurd, Nasir Xanê Azadpûr ve bi farisî hatiye amadekirin û weşandin. Her wiha Hejar Mukriyanî, xebat wergerandiye ser kurdiya soranî. Lê ew bi xebata Mah Şeref Xanimê tenê nemaye, hin xebatên li ser Mîrektiya Erdelanê jî kiriye nav vê xebatê. Pirtûka Mestûreyê ya bi navê 'Dîroka Erdelan' li Moskowayê di sala 1990'î de bi zimanê rûsî tê çapkirin.

Mah Şeref Xanimê her wiha pîrtûkek dînî jî amade kiriye der barê 'Şerîeta Îslamê' de. Pirtûkên wê nîşaneya lêhûrbûn û lêkûrbûna wê ya der barê dîn û dîrokê de dide nîşandan. Wê bi xwe '12 ilm qedandiye.' Pirtûkên dînî bi zimanê erebî xwendiye.

Li gorî hin çavkaniyan dîwana helbestên Mestûre ji 20 hezar beytî pêk tê. Lê belê, dîwana wê ya helbestan, ji ber jiyana wê ya koçberî, zehmetî û qeyranên nav mîrektiya Erdelan winda bûye.

Hevjînê Mestûre Erdelan, Xesrew Xanê Erdelan, dadgerê wê derê bûye û bi mirina wî re mîrîtiya Erdelan dikeve destê Qaçaran. Bi êrîşên serweriya Qaçaran ên di sedsala 19'an de ya bi ser mîrtiya Erdelan, Mestûre tevî malbata xwe neçar dimînin ku koçî Silêmaniyê bikin û li gel mîrtiya Baban bi cih dibin.

Tê gotin ku Mestûre Erdelan, di vê pêvajoya koçkirinê de gelek zehmetiyan re rû bi rû dimîne. Lawê wê Riza Qolî Xan ku xelefê bavê xwe Xesrew Xanê Erdelanî bû, tê girtin û wî diavêjin zindanê.

Mestûre di pirtûka xwe de, wiha qala jiyana xwe dike: "Ez a bêqîmet û hejar a navê wê Mestûre -ku ez keça Ewlesen Begê û neviya Xwedê jê razî Hemê Axayê Kurdistanî me- ji ber ku bavê min gelek hez ji xwendinê dikir û ez jî keça wî ya yekem bûm, gelek hez ji min kir, min da xwendinê. Min gelek xwe dabû kitêban, hemû cûre kitêb dixwendin, di nav wan de min gelek ji dîrokê hez dikir."

**Mijar û şêwaza helbestên wê**

Mah Şeref Xanim di nivîsên xwe de zimanê sade bi kar tîne. Meriv di rêzikên helbestên wê de dewlemendiyeke bêhempa dibîne.

*Îro, mîna saqî! Ji çîmenan re demsal payîz e*
*Meyê bide, nefikire bê meh remezan e*
*Li şîretên şêxî nefikire û ji dest re,*
*Ne çerxiyek û du û sê, ev fitwa min ji pîrê magan e*

Wekî mijar ji dema ku tê de ye bi gazinc e. Di helbestên xwe de, qala hesretiya bajarê xwe Sineyê dike.

*Çima ev çerxa felekê, zulmê dike ew gelekê*
*Dilê mine nazik xweşik, kun kirî wek elekê*

*Çavê min kir kanîya xûnê, poşman kirim ji hebûnê*
*Gelo çima min çi kirî, dilkê mi bû wek êtûnê*

*Herdem ji çavên min dizê, sed çem û sed sîrwan û zê*
*Ew derdê min dîtî bibêj, ka kê dîtîye kû û kê?*

Jiyana xwe û kevneşopiya gelê xwe, bi awayekî vekirî di misrayên xwe de rêz dike.

Mah Şeref Xanim, bi girêdayiyê gelê xwe û axa xwe bûye. Yek ji mijarên helbestên wê jî evîn e. Tê gotin ku, bi hevjînê xwe Xesrew Xan re gelek bextewar bûye. Zewaceke dilşad derbas kirine. Meriv di van rêzikên helbestên wê de vê hezkirina wan dibîne.

*Ji bilî ser têkiliya wî min awir tune ye*
*ji xwe ji bilî wî min fikar tune ye*
*her çiqas henaseya min ne li bîra min be, ji wî û min*
*Ji bilî henaseya sar min bîranîn tune ye*
*bextewar im li ber dûrbûna ji bejna wî ya bedew*
*Ji bilî xema wî qet min xemgînî tune ye*

Mestûre di vê helbesta xwe da, der barê jiyan û serpêhatiyên pêxember, ewliya û îmamên wekî Yehya, Îsa, Mûsa, Meryem, Yûsif, Yaqûb, Eyûb, Yehûda, Salih, Muhemed, Elî û şerê Kerbelayê û êxsîrbûna binemala Hesen û Huseyîn, jehrîdana Îmam Riza û gelek bûyer û serpêhatiyan dinivîsîne.

*Yan min kirî zulmên di zor li zarokên pêxemberî*
*Min berda gewriya wan kuran ew camika pir zeherî*

*Min kuşt gelo zarên 'Elî, işkad ji Zehrayê mi dil*
*Min kir serî hola serî, min kir dilê Ehmed bi kul*

*Ma min kot û zincîr kirî, di gerdena Secadî da*
*Yan newgulên mala nebî, bêtore min ber badî da*

*Min canikên peyxemberî, aware çolan da gerand*
*Xewa şevan jî min gelo ji çavê sêwiyan herimand*

*Gelo min jehrdayî kirî, lawên nebî min kuştine*
*Yan kuştina wan sêwiyan tawan û hem sûcê min e*

Mestûre Erdelan, di sala 1847'an de (ku di gelek cihan de jî 1848 derbas dibe) li Silêmaniyê di 44 saliya xwe de jiyana xwe ji dest daye.

**Berhemên Mestûre Erdelan**

Baweriya îslamê û Rîsaleya 'Îbadetê. (Bi farsî)
Dîwan (Dîwan-î Masturah Kurdistanî) – farsî û Kurdî
Mêjûy Erdelan (Khronika Doma Ardalan: Ta'rikh-i Ardalan/ Dîroka Erdelanê bi zimanê farsî hatiye nivîsîn.



Samî Hêzil

# Oedipusa Kurdî: Hesen, Şêrhesen û Gulperî

Çîroka *Oedipus Rex* a ku Sophokles di B.Z. 400'an de wek nimûneyeke trajedyayê nivîsiye li seranserê cîhanê navdar e. Ev navdarî bi saya serê şîroveya Freud a çîrokê ya bi şêweyekî psîkanalîstî hîn berfirehtir bûye ku di lîteraturê de wek 'kompleksa Oedipus' tê zanîn. Bêguman sepandina nêrîn û şîroveyên psîkanalîstî yên li ser berhemên edebî, bi taybetî jî li ser berhemên edebiyata devkî, şixuleke têkilhev e. Teoriya psîkanalîst berhemeke fikrî ya rojavayî ye, lewre daneyên ku xudanên vê teoriyê pê xebitîne piranî aîdî çanda rojava ne. Ji ber vê çendê jî dema berhemeke aîdî çanda rojhilat bi teorî, têgeh û kategoriyên rojava tê analîzkirin, îhtimala şîroveyên zorpêdayî û neguncav zêdetir dibe. Dîsa jî çîroka kurdî ya bi navê *Hesen, Şêrhesen û Gulperî* bi mijar, tema û motîfên hevpar û cî bi cî bi cudatiyên berbiçav hêjayî nirxandineke psîkanalîst e.

Çîroka *Hesen, Şêrhesen û Gulperî* ji aliyê H. Akyol ve ji herêma Bîsmîlê hatiye tomarkirin û di nav Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de bi navê *Çîrokên Kurdî Senem Xanim* hatiye çapkirin. Çîrok bi vê gotinê dest pê dike: *Padîşakî xewekî dî, di xewa xwu da layê(kurê) gavanekî qetil kir.* Lewre Padîşah şivan û gavanên welatê xwe tev kom dike û bi vî awayî jî pê dizane ku gavanek ê di demeke nêzîk de bibe bav. Jê dixwaze ku wextê zarok hat dinê wî bîne qesrê. Piştre jî fermanê dide celadên xwe da ku zarokê bibin çolê û bikujin. Celad tên rehmê, zarok ji hêla dêleşêrekê ve tê xudankirin. Wek motîfeke binas, ên ku zarok ji bo kuştinê dibin ciheke dûr, tên rehmê û zarok şûnde dihelin û vedigerin. Zarokê ku li çolê hatiye hiştin ji hêla ajalekê ve tê xudankirin.

Sal di ser re derbas dibin û rojekê nêçîrvan şêrekê û du çêlikên wê (yek ji wan çêlikan jî ew kurik e) li daristanê dorpêç dikin û xeberê dişînin ji Padîşah re. Kurekî Padîşah hebûye bi navê Hesen, vêca wî kurikî jî wek Şêrhesen bi nav dike. Hesen û Şêrhesen bi hev re mezin dibin. Rojekê Hesen û Şêrhesen mifteya bavê xwe ji berîkê derdixin û dikevin nav çil odeyên wî. Hesen li odekê wêneya keçikekê dibîne û demildest dibe evîndarê wê. Hesen pir li ber xwe dikeve û axiriyê jî terka welatê xwe dike, diçe deverên dûr. Şêrhesen jî li pey wî dikeve û serpêhatiya wan dest pê dike.

Di çîrokên rojavayî de piranî zarokê ku tê dinê bavê xwe dikuje an jî bobelatekê bi xwe re tîne, lewma jî bav hewl dide ku bûyîna wî zarokî asteng bike. Di çîroka *Hesen, Şêrhesen û Gulperî* de, Padîşah kuştina kur a bi destê xwe di xewnê de dibîne–ev yek bi şiklekî berovajîbûna motîfê ye. Mifteya çil odeyan û tiştên nav wan çil odeyan, bi taybetî jî wêneya keçikê, tev dikarin wek binhişa takekesî ya Padîşahê bavê wan bê şîrovekirin. Eger em odeya veşartî wek binhişê bav şîrove bikin, vê çaxê em dikarin bibêjin ku azweriyên bav û kur di binhişê de tûşî hev dibin û ew heman azwerî xasyeta serboriya wan a nav çîrokê diyar dikin.

Motîfa veqetîna kurê gihîştî ya ji desthilatiya dêûbavê xwe di şexsê Hesen de pêk tê. Hesen dikeve bin bandora resma li odeya veşartî hilavistî û gelek li ber xwe dikeve. Hesen ji vê tengejeyê bi rêya terkdana welatê xwe xilas dibe. Serpêhatiya wan dûr û dirêj e. Diçin welatên dûr, rastî Gulperiyê tên, dêwan dikujin û bi xelat û gencîneyê dizivirin. Di rêya vegerê de, dema li binê darekê radikevin du kevok tên û di axaftina navbera xwe de pîlana bavê wan aşkera dikin ji Şêrhesen re. Kevok pîlanên bisêr ên bavê wan aşkera dikin. Bav kuştina kur bi rêya sêran tesewir dike, ji ber ku hişmendî/aqilê civakî rêya kuştina kur a ji destê bav digire. Sêr wek çareseriyeke binhişî tê hawara bav ê ku dixwaze kur bikuje û tişta destê wî jê bistîne. Di dawiyê de kuştina bav pêk tê. Ne bi destê kurê wî Hesen, lê bi daxwaza Hesen bi destê Şêrhesen ve kuştin pêk tê. Di vir de tê dîtin ku ji bo qetla bav rêyek hatiye dîtin. Çawa ku bav nikare bi şiklekî aşkera kurê xwe bikuje, ji ber ku di çanda civakî de kuştina kur tiştekî ne rewa ye, bi heman awayî jî di dawiya çîrokê de kur (Hesen) bi destê Şêrhesen–ê ku kurê padîşah ê rastî nîne– bavê dide kuştin.

Di vê çîrokê de jî armanca sereke ya leheng gihîştina miraz/bidestxistina keçekê ye, bes armanca wî û ya bavê wî bi awayekî rasthatinî tûşî hev dibin. Hesen dibe evîndarê keçika ku wêneya wê di odeyeke veşartî ya bavê xwe de dibîne, bi vî awayî jî şêweyeke fantaziya malbatî dibe peywenda çîrokê. Figurên çîrokê – padîşah wek bav, Hesen û Şêrhesen temsîla kurên ku reqîbê bav in û Gulperî jî objeya daxwazê û xelat leheng– tev dikarin wek hêmanên sembolîk ji bo şîroveya psîkanalîst bên şixulandin. Arîşeya sereke bi ser Padîşah –wek fîgurê bav– saz dibe her ku xewna kuştineke têkildarî kur dibîne. Di qonaxa dawî ya çîrokê de Hesen bi xelata xwe an ku bi dotmîrê vedigere warê bavê xwe û piştî çend ceribandinên li dij bavê xwe Hesen bi alîkariya Şêrhesen bavê xwe têk dibe û arezûyên wî yên li hember hezkiriya xwe ditemirîne û digihîje encama hêvîkirî.

# Lêgerîna edaletê û rûyê faşîzmê

Hisên Çatikkaş

Edalet û faşîzm du têgehên dijî hev in, lewma devera ku edalet lê heye, faşîzm qels dibe, lê devera edalet lê qels be faşîzm zêde dibe. Li gorî diyalektîka Hegelî ev her du têgeh nikarin hev tune bikin, helbet qadê li hev teng dikin û dixwazin hevdu tune bikin, bêguman yek nikare ya din xilas bike. Bingeha têgeha edaletê digihije yewnana kevin ku ji wir heta roja îro gelek caran bûye mijara gengeşiyên filozofiyê. Yek ji wan filozofên ku ewilî li ser edaletê nivîsiye jî Sokrates e. Sokrates edaletê bi qanûnan ve girê dide. Li gorî wî kesên biedalet divê li gorî qanûnan tevbigerin. Xwendekarê Sokratesî Platon jî edaletê weke otorîteya civakê pênase dike. Dema em pênaseyên van her du filozofan tenê jî mêzînin, em ê bibînin ku dagirkerên Kurdistanê gelek ji edaletê dûr in. Bêedaletiyeke mezin li ser kurdan ferz dikin. Lewma kurd jî li hemberî vê bêedaletiyê ketine nav lêgerîna edaletê, edaleta ku li hemberî îslama kesk qels bûye! Gelo li ku ye ev edalet?

Çawa nasyonal sosyalîzma Hîtler li Almanyayê û falanjîzma Franko li Îspanyayê faşîzm pêş xistin û bi mîlyonan mirov qetil kirin. Îro li Kurdistanê jî îslama kesk bi faşîzane kurdan dikuje, îşkenceyê li wan dike, digire û diavêje girtîgehan. Tu cudahî di navbera van her sê bîrdoziyan de tune ye. Rêbazên her sê bîrdoziyan jî faşîzm e. Faşîzm tenê li gorî bîrdoziyekê tê organîzekirin û ev jî li gorî bîrdoziya desthilatdariyê û serokê wê ye. Çapemenî li gorî vê bîrdoziyê tê dîzaynkirin. Dengê cuda tên birîn an jî pêşiya deng û ramanên cuda tê qutkirin. Yek deng, yek al, yek dewlet, yek ziman û yek ol dibe bîrdoziya sereke ya vê pergalê. Helbet faşîzm, hiqûqa dewletê jî li gorî xwe sererast dike. Kesên dijî van derdikevin ji aliyê amûrên bîrdoziya vê pergalê ve tên cezakirin an jî tên kuştin. Îro li tevahiya Kurdistanê dagirkerên Kurdistanê li ser kurdan vê yekê ferz dikin, her çiqas ast û rêbazên wan cuda bin jî ferzkirin bi heman awayî ye: kuştin, darvekirin, êşkencekirin, zîndankirin...

Di faşîzmê de tişta ku jiyana mirovan bi rê ve dibe neteweperestî ye ku ew jî niha di destê îslama kesk ango faşîzma kesk de ye. Faşîzma kesk bê navber li bajarên Tirkiyeyê êrîşî kurdan dike û wan dikuje. Piştî her kuştinê rayedarên tirk derdikevin û dibêjin ku ev ne tişteke nijadî ye. Her çiqas ew wisa bibêjin jî em kurd dizanin ku di van êrîşan de tenê aliyek(kurd) tên qetilkirin. Tenê van mehên dawî de bi dehan êrîş çêbûn li ser kurdên ku li tTirkiyeyê



dijîn û gelek kurd di van êrîşan de hatin qetilkirin. Bi salan e li Kurdistanê bi destê polîs û leşkerên tirk kurd tên qetilkirin. Heke ev êrîş ne nijadî bin nexwe çi ne?

Li hemberî van êrîşan berxwedana kurdan jî bê navber didome û doza edaletê ji dagirkeran dikin. Lêgerîna edaletê ya herî dirêj, bêguman Dayîkên Şemiyê ne ku ev 855 hefte ne bê navber doza edaletê dikin. Ya din jî malbata Şenyaşar e ku ev nêzî 160 roj e li edaletê digerin. Ev nêzî 590 rojî ye ku malbata Gulîstan Doku li keça xwe digere. Ev deh sal e ku malbatên Roboskiyê li edaletê digerin. Meriv dikare vê lîsteyê dirêjtir jî bike lê tenê ev têrê dikin ku faşîzma dewleta tirk nîşan bidin. Tevî van jî li ser medyaya civakî em dibînin ku mirov her roj li pey edaletê ne. Gelek caran em dibînin bi zora medyaya civakî hindik be jî edalet xwe nîşanî me dide.

Werhasil di pergaleke faşîst de edalet derziya di nav loda kayê de ye. Ancax meriv dikare bi hevkarî û alîkariyeke mezin faşîzmê têk bibe. A dikeve ser milê kesên dijberê faşîzmê xurtkirina lêgerîna edaletê ye. Û divê em ji bîr nekin ku temenê faşîzmê her tim kurt bûye lê li pey xwe jî qetlîamên mezin hiştiye. Lewma li hemberî faşîzma kesk divê em haj hev hebin...

# Bangên ji bo vegera efrîniyan

Prz. Hisên Îso

Di destpêkê de mafê vegera efrîniyan bo bajar û axa wan li gorî hemû urf û adetan, li gorî hemû rê û rêbazên dînî û mirovî û li gorî mafê mirovan ê navneteweyî, mafekî rewa û pîroz e. Ev maf tenê mafê wan kesan e ku bi darê zorê ji malên wan hatine derxistin û nabe kesek bi vê yekê bazirganî û siyaseta xwe bike. Biryara vegerê an jî mana li cihê ku lê bi cih bûne tenê mafê wan kesan e, mafê tu aliyên siyasî nîne. Ez ne tenê dixwazim efrînî vegerin ser axa xwe lê ez dixwazim heta ew bizin û mihên wan ên hatibûn dizîn jî vegerin ser axa xwe.

Lê ez wekî welatiyekî efrînî ku li derveyî welat dijîm, wî mafî di xwe de nabînim ku ji kesekî re bibêjim vegerin Efrînê an jî venegerin Efrînê. Dibe ku heke ez niha li Efrînê bûma fikir û ramanên min di vê der barê de cuda bûna.

Hinek kes di vê dema dawî de di hin dezgehên medyayê de 'li def û zirnê didin' ku xelkê Efrînê vegerin bajarê xwe, lê ji bîr dikin ku çi kesên hewl didin vegerin dibin nêçîra wan çeteyên ku di malên wan de bi cih bûne.

Mijara vegera efrîniyan ne wiha hêsan û ji rêzê ye û wiha bi vegera çend malbatan ev mijar çareser nabe. Vegera çend kesan wekî nuqteyekê ji ava deryayê ye, ji ber ku mijarekî gelekî têkil û tevlihev e. Ji ber ku ew kesên ji malên xwe hatine derxistin niha çete û malbatên ku anîbûn wir li wan malên wan dijîn. Ne tenê jiyanên wan, çeteyan dest danîne ser dar, zevî û mal û milkên wan jî.

Lewre heke bi rastî ENKS dixwaze xelkê vegerîne Efrînê û heke bi rastî ne bazirganiyê bi vê mijarê dike bila bi hevalên xwe yên Muxalefeta Sûriyeyê re ku bi riya çeteyan Efrînê dagir kirine, peymanekê çêbikin, çeteyên di malên wan de bi cih bûne jê derxîne, riyên biewle ji bo vegera wan koçberan bibîne ku vegerin ser axa xwe. Bila peymanekê bi hevalbendên xwe yên tirk û muxalefeta ku ew endamekî wê ye çêbike. Bila mal û milkên xelkê Efrînê li wan vegerîne û wê gavê banga vegera efrîniyan bibîne.

Heke ev ne derew û reklameke vala ya bazirganiyê be, bila ENKS hevalbend û alîgirên xwe yên ku li Libnan, Tirkiye û başûrê Kurdistanê dijîn pêşî bi rengekî biewle vegerîne Efrînê û paşê bangên wiha li gelê Efrînê yê koçber bike.




# Beriya 180 salî jî îngilîzan xwe ji Kabulê vekişandibû

Navenda Nûçeyan

Beriya 180 salî dema ku leşkerên Îngilîstanê xwe ji Kabulê ber bi Îslamabadê de vekişandin, di vekişînê de bi hezaran leşkerên îngilîz hatin kuştin. Hêza Îngilîstanê ya bi serokatiya general William Elphinstone xwe ji Kabulê ber bi Îslamabadê de vekişandibû li gorî çavkaniyên wê demê tenê leşkerekî îngilîz sax gihabû Îslamabadê yên din tev an hatibûn kuştin an jî dîl hatibûn girtin.

Destwerdana Îngilîstanê ya Afganistanê vedigere sedsala 19'an ku di wê demê de Îngilîstanê dixwest mêtingeriyên xwe yên wekî Hindistanê li hember Rûsyayê biparêze û nehêle Rûsya li wir bi cih bibe.

Bêyî ku berxwedaneke mezin li dijî wan hebe bi salan Îngilîstanê leşkerên xwe li Kabulê hiştin, piraniya hêzên xwe vekişandin Hindistanê û tenê 4 hezar 500 leşker li Kabulê hiştibûn.

Paşê bi serkêşiya Mihemed Ekber Xan (kurê mîrê afganî, Dost Mihemed Xan tevgereke berxwedanê hatibû avakirin û bi rêbazên şerê bi komên biçûk gelek leşkerên Îngilîstanê kuştibûn.

Bi destpêka şoreşa mezin li dijî leşkerên Îngilîstanê general William Elphinstone ku serkêşiya artêşê dikir biryar dabû ku 4 hezar û 500 leşkerên xwe yên li Kabûl û 12 hezar leşkerên alîgirên wan ên afgan û hindî vekişîne Islam Abadê.

Tevî ku Mihemed Ekber Xan soz dabû îngilîzan ku riya vekişîna leşkerên wan veke û di rê de xwarin û vexwarina wan jî peyda bike lê di dema vekişînê de û bi taybetî di çiyayên asê ên Hindokoş çekdarên bi serkêşiya Mihemed Xan êrîşî leşkerên îngilîz kirin û hema bibêje hemû leşkerên ku xwe vekişandin an kuştin an jî dîl girtin.

Di roja 9'ê sibata 1842'an de di 3 rojên pêşî ên xwevekişandinê de zêdeyî 3 hezar leşkerên îngilîz hatin kuştin û di 11 sibatê de general Elphinstone xwe radestî Mihemed Xan kir. 200 leşkerên îngilîz û 2 hezar 500 alîgirên wan şerê xwe yê dawî kiribûn û di roja 13'yê sibatê de leşkerê ku bi tenê xwe gihandibû Îslamabadê William Brydon bû.

Di sala 1879'an de şêwekara îngilîz Elizabeth Thompson ev wêneyê leşkerê ku bi tenê sax mabû xêz kiriye.


William Brydon

# Dixwazin nijadperestiyê peş bixin

Navenda Nûçeyan

**Her roj bi hezaran penaber ji Afganistanê têne Tirkiyeyê. Hikûmeta Tirkiyeyê bi van penaberan hem dixwaze şerê nijadperestiyê pêş bixe hem jî dixwaze koletiyek kûr û kedek erzan pêş bixe**




Talîban di 15'ê tebaxê de ket bajarê Kabulê û bi temamî rêveberiya Afganistanê bi dest xist. Piştî Talîban ket paytextê Afganistanê, Kabulê bi deh hezaran welatiyan berê xwe dan balafirgehan û xwestin Afganistanê terk bikin. Têkildarî ketina rêveberiya Afganistanê, nivîskar û rojnameger Faîk Bûlût ji bo rojnameya Xwebûnê nirxandinên girîng kirin.

Nivîskar û Rojnameger Faîk Bûlût, bal kişand ser bidestxistina Kabulê û wiha got: "Bidestxistina Kabulê ya ji aliyê Talîbanê ve ji bo min ne surprîz e. Ji ber ku NATO û DYA'yê li wir nekarîbû artêşekê ava bike. Lê bidestxistina Kabulê a ji aliyê Talîbanê ve di hevsengiya navdewletî de guhertinên girîng ava kir."

Bûlût da zanîn ku ji aliyê NATO û DYA'yê ve ev ne têkçûneke nû ye û wiha got: "Her kes dizane ku DYA'yê çawa xwe ji Vîetnamê vekişandiye. DYA her ku diçe xwe dikişîne nava xwe. Hêza xwe ya li Rojhilata Navîn kêm dike. Hejmara leşker û balafirên xwe kêm dike. Li Rûsya, Iraq û Yemenê têkiliyên xwe ji nû ve rast dike. Hewl dide bi Îranê re li hev bike. Li Sûriyeyê hêj çi bike tam ne diyar e."

**Xwe ji bo Rûsya û Çînê amade dike**

Faîk Bûlût diyar kir ku DYA hêza xwe vedikişîne û hêza mezin ji bo têkoşîna li dijî Rûsya û Çînê amade dike. Bûlût, da zanîn ku hatina Talîbanê ji bo Rûsya û Çînê hem firsend e û hem jî qeyran e û wiha got: "Dema DYA'yê xwe ji Afganistanê vekişand, xwest vê giloka belaya Talîbanê li sere Çîn û Rûsyayê bigerîne. Dibêje ez di vê çiravê de xeniqîm, bila hinekî jî ew tê de bigevizin. Yanî mirov dikare bibêje Talîban versîyona DAIŞ'ê ya duyemîn e. Tu cudakariya Talîban ji DAIŞ û El Nûsrayê tune ye. Rûsyayê ewil got bila DYA di vê çiravê de bixeniqe, bê kutan. Bi rastî jî wisa bû. Niha jî DYA dibêje ez bi Talîbanê re dernekețim serî ez vê belayê bînim serê we. DYA'yê li vir nêzî 2 trilyon dolar pere xerc kir. 20 salan bi ser neket."

Bûlût anî ziman ku Rûsya û Çîn ji aliyekî ve dixwazin bi Talîbanê re hevkarî û diyalogê bikin, li aliyê din dixwazin belaya Talîbanê li serê DYA'yê bigerînin û wiha got: "Bi vê pêvajoyê re niha hevsengî xera bû. Dixwazin ji nû ve hevsengiyekê ava bikin."

Bûlût bi bîr xist ku Serokkomar Tayyip Erdogan û Joe Bîden li Zîrveya NATO'yê hevdîtinekê kirin û wiha berdewam kir: "Erdogan di vê hevdîtinê de fikrekê pêşniyazî Joe Bîden kir. Got 'Karê ewlehî û rêvebirina Kabulê em bikin. Karê îdarî û ewlehiyê bidin me.' Em dizanin navbera Tirkiye û DYA'yê xerab bû. Tirkiyeyê xwest di navbera xwe û DYA'yê de pirekê ava bike û li hev bikin. DYA'yê jî i awayekî erênî nêzî vê pêşniyazê nêrî. Wisa difikirîn ku Kabul dê di rêveberiyê de bimîne û Talîban jî hevkarê wê yê koalîsyonê be. Lê niha Talîban bi serê xwe bû hikûmet. Ji ber vê yekê mutabaqata Tirkiye û DYA'yê ku têkildarî Kabulê li hev kiribûn pûç bû."

**Tirkiye dest jê bernade**

Bûlût bal kişand ser helwest û planên Tirkiyeyê û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tirkiye dîsa dest ji planên xwe bernade. Dê dîsa hewl bide ku hêza xwe li wir bi cih bike. Dîsa dê hewl bide ku ewlehiya balafirgeha Kabulê bixe destê xwe. Dê bixwaze bazirganî û rêveberiya wir bi dest bixe. Dê hewl bide îhaleya rê û xizmetên din têxe destê xwe. Niha dibe ku Tirkiye ji welatên cîhanê re bibêje 'Talîban rêxistin e. Diyar e dixwaze dewleta îslamê ava bike. Lê em hinekî wê terbiye bikin û nerm bikin. Ji ber vê yekê divê hûn piştgiriyê bidin min. Ez bibim terbiyekarê vê yekê. Ez ê rê û rêbazan bibînim. Dikare pêşniyazeke wisa bike."

Bûlût destnîşan kir ku dema Tirkiye vê piştgiriyê ji welatên cîhanê bixwaze dê li hemberî wê tiştên şenber bixwaze û wiha axivî: "Dê bibêje tenê di gotinê de piştgiriyê nedin min. Di aliyê aborî û lojîstîkê de jî divê hûn piştgiriyê bidin min. Dikare bibêje em van projeyan bi hev re pêk bînin û bi hev re şîrketan ava bikin. Hûn dizanin ku Tirkiye li Karabaglar û Azerbeycanê hin baregeh ava kirin. Dikare di navbera Asyaya Navîn, Afganistanû Kafkasya de li gorî xwe pira leşkerî û siyasî ava bike. Ev projeyên di hişê hikûmeta Tirkiyeyê de ye. Lê Çîn û Rûsya jî bi hêsanî destûr nadin vê yekê. Pirsgirêkên di nava Îran û Tirkiyeyê de pir zêde ne. Îran pir naxwaze hêza Tirkiyeyê li wir pêş bikeve. Ev nayê hesabê Îranê jî."

**Talîban dê dewleta îslamê ava bike**

Bûlût bal kişand ser helwesta Talîbanê ya li hemberî cîhanê jî û ev tişt lê zêde kir: "Talîban sozek wisa dide dinyayê. Berê ji bo ku hêzên navdewletî wê qebûl bike, gotinên nerm dibêje. Dibêje 'Em dest bawerî û nirxên kesan nadin' Lê ez bawer dikim ev ji bo demeke kin derbasdar e. Lê piştî Talîban îqtîdara xwe mîsoger bike, dê dewleta îslamê û şerîatê ava bike. Ev pir aşkera ye. Dibêje ez mudaxaleyî karê navxweyî yên tu dewletan nakim. Dibêjê ez ê cîhadvanan neşînim welatên din. Lê nabêje ez ê cîhadvanan li axa xwe neparêzim. Heta niha beşek ji Nûsra, Çeçen, El Qaîdeyê li vir hebûn. Dê ji niha û şûnde bêhtir li vir hebin. Dê hejmara wan zêdetir bibin."

**Perwerdeya leşkerî dîtine**

Bûlût bi lêv kir ku penaberên ji Afganistanê derbasî Tirkiyeyê dibin ji 3 paran parek wan kesên perwerdeya leşkerî dîtine û wiha axivî: "Em çi dizanin ku wan wekî hêza mîlîs a li dijî muxalefeta hundir bi kar nîne? Niha polîtîkaya Tirkiyeyê ya li dijî penaberan hêj tam zelal nebûye. Rojekê Erdogan dibêje 'Kî dibêje penaber qefil bi qefil derbasî Tirkiyeyê dibin. Tiştekî wisa tune ye. 3 roj şûnde dibêje erê di sînor re derbas dibin. Em dîwar li pêş wan ava dikin.' Lê rastiyek heye penaber derbasî Tirkiyeyê dibin. Îran jî çavê xwe ji hatina wan re digire. Îran dixwaze Tirkiye bi vê meseleye re mijûl bibe.

Divê mirov qebûl bike ku Tirkiye welatekî raqîb e. Tirkiye hem li Iraqê û hem jî li Sûriyeyê li dijî Îranê welatekî raqîb e. Lê hêj ne dijmin e. Niha Afganistan jî li vê yekê zêde bû. Îran Tirkiyeyê wekî welatekî raqîb dibîne. Ji ber vê yekê her tim dixwaze karê wê xera bike.

DYA'yê têkildarî penaberan gotin ji devê xwe derxist. Got li ser navê me bên li Tirkiyeyê bibin mêvan.

Beşek kesên derbasî Tirkiyeyê dibin şîî ne. Beşek penaberan ji herêma di bin kontrola Îranê de nin. Beşeke din jî ji herêma Îtîfaqa Bakur in. Xêncî peştûyan beşeke wan jî kesên ku xwe ji nijadeke turkî dihesibînin bi xwe ne. Ozbekên ji koka turkîyan in. Hinek jî qirxiz in. Ji berê de tê zanîn ku ev kesên derbasî vir dibin mîlîs in û perwerdeya leşkerî dîtine. Pir zelal e ku van kesan perwerdeya leşkerî û çekdarî dîtine. Beşek ji wan di sazî û rêxistinên bi dewletê ve girêdayî de perwerde dibin. Di demên dawî de gotegotên wisa jî derketin. Hat gotin ku saziyên girêdayî dewletê van kesan perwerde dikin. Yên vê yekê dizanin jixwe dizanin. "

**Wê demografiyê biguherînin**

Bûlût li ser bandora penaberan a guhertina demografiyê jî rawestiya û wiha pêde çû: "Wê li Tirkiyeyê di aliyê demografiyê de guhertineke mezin pêk bînin. Herî zêde berê xwe didin Anatoliya Navîn. Bi vê yekê dixwazin bingeha Îtîfaqa Cûmhûr xurt bikin. Dîsa li Wanê û Amedê belav dibin. Bi cih dibin. Dikarin li erdnîgariya kurdan di aliyê demografiyê de guhertineke mezin çêbikin. Bi her awayî xuya ye ku dê demografiyê biguherîne. Ya din jî siberojê kes û hikûmeta ku naxwaze îqtîdar bê guhertin û di hilbijartinê de naxwazin biçin, dê van kesan wekî mîlîsan li dijî kesên serî hildidin bi kar bîne. Em vê yekê ji gotinên rayedaran fam dikin. Dibêjin ev rojên we yên xweş in. Hêj rojên we yên nexweş nehatine. Yên ku naxwazin hikûmetê terk bikin ji bo siberojê tedbîrên xwe digirin. Vê hêz li Sûriyeyê bi kar anîn. Li herêmên ku li Sûriyeyê xistin kontrola xwe û li Lîbyayê ev hêz bi kar anîn."

**Aboriya Tirkiyeyê têk çûye**

Bûlût bal kişand ser bandora penaberan a li ser aboriyê jî û wiha bi dawî kir: "Diyar e Tirkiye di aliyê qeyrana aborî de hilweşiya ye. Her ku qeyran mezin dibe piyaseya hêza kedê û kar erzan dibe. Rayedarên AKP'ê bi xwe gotin 'Hûn hêj çi dixwazin. Tên li vir bi erzanî kar dikin. Ey şîrket û karsaz ha ji were ked û karên erzan. Hûn hêj ji xwedê çi dixwazin. Di heman demê de bi vê yekê wan dikin şirîkê keda mirovên ji Amed, Qers, Wan û bajarên bakurê Kurdistanê. Dîsa wan dikin şirîkê keda mirovên betal ên Rojavayê Tirkiyeyê. Ev rê li ber koletiyeke pir mezin vedike. Rê li ber kedxwariyeke pir mezin vedike. Lê vê pergalê şaş fam dikin. Nabêjin ev bi destê AKP'ê û pergala kapîtalîst tê avakirin. Nabêjin ev bi destê komên sermayedar tê kirin. Bi vê yekê mirovên betal ên li Rojava û bakurê Kurdistanê dixin qirika hev û li hev sor dikin. Bi vê yekê rê li pêş şerê nijadî vedikin. Mînaka vê yekê li Altindag a Enqereyê pêş ket. Garantiya vê yekê tune ku sibê li Amedê û bajarekî din jî pêk neyê. Ez wisa difikirim ku hêzên kûr ên girêdayî dewletê vê yekê sor dikin. Dixwazin şerê nijadperestiyê pêş bixin û îqtîdarê rehet bikin. Wekî ku dixwazin çareser bikin xwe nîşan didin."

# PDK gundan vala dike, SMO'yê bi cih dike

Navenda Nûçeyan

Operasyonên Tirkiyeyê yên di 23'yê nîsanê de li Metîna, Avaşîn û Zapê yên Herêma Federe ya Kurdistanê hatin destpêkirin, didome. Tirkiye ku nikare li qada bejahî pêş bikeve, bi ÎHA, SÎHA, balafirên şer û helîkopteran qadên Girê Sor, Tabura Ereban û Girê Spî yên girêdayî herêma Avaşînê bi awayekê ketûber bombe dike. Tirkiye li qadê, zehmetiyên dijwar dijî. Ji ber vê yekê hêzên taybet ên girêdayî PDK'ê dixe pêşiya xwe û dixwaze ji bo xwe qadên nû veke. Di şerê li herêma Avaşînê de gelek leşkerên TSK'ê hatin kuştin. PDK ji bo pêşiya vê bigire, 70 gundên ji herêma Zaxo bigire heya Bradostan vala kir. Niha jî li van gundan malbatên hêzên çekdar bi cih dikin. Xebatên bicihkirina endamên SMO û malbatên wan ên ku ji Sûriyê anîne, yên li cih û warên li Zaxo, Amediyê û Duhokê hatine valakirin dewam dikin. Di çarçoveya vê planê de, Tirkiye hewl dide penaberên afgan li vê herêmê bi cih bike. Ger ev plan bi ser bikeve, wê heman rewş li herêmên Silêmanî û Helepçe ku YNK lê serdest e, dewam bike. Tê diyarkirin ku agahiya Waliyê Dihokê Elî Tatar jî der barê vê plana berfireh de, heye.

**Sîxuriyê pêş dixin**

Tirkiyeyê stratejiya avakirina herêmeke tampon di 24'ê tîrmeha 2015'an de xist meriyete. Niha hewl dide bi rêya PDK'ê xeta Amediyê û Metînayê ji hev cuda bike û baregehên xwe li cihên stratejîk ava bike. Li gundê Banke yê Serê Metîna ku pêşiya qada Çiyayê Spî vedike hêzên Zerevanî hatin bicihkirin. Li gel van hemû pêşketinan, bi navê parastinê sîxuriyê li herêmê pêş dixe.

Tirkiyeyê di qanûna 2017'an de, li xeta Raperîn Soran dest bi operasyonan kiri bû. Tirkiyê bi vê xwest ku xeta Behdînan (Zap, Metîna û Heftenînê) û xeta Soran (Xakurkê, Xinêrê, Diyala û Sîdeka) ji hev veqetîne. Niha Tirkiye bi awayekî qismî li vê qadê bi cih bûye.



# Jîn û jiyanê dikujin û dişewitînin

M. Alî Ertaş

Hêzên serdest çavkaniya jiyana xwe ji tarîtî û kuştinê digirin. Ji ber vê yekê her tim ji tariyê hez dikin û di tariyê de dijîn. Dijminên ronahî û rojê ne. Ji ber ku dema roj hiltê û her der ronî dibe êdî nikarin xwe veşêrin û teşhîr dibin. Dîsa hêza xwe ji kuştinê digirin. Ji ber ku cihê jiyan lê hebe berxwedan û raperîn heye. Azadî heye. Lêgerîn û lêpirsîn heye. Ji bo kes hesab ji wan nepirse û qadê li wan teng neke, wan dikujin. Kesên mafên xwe diparêzin, ji ber ku qada serdestiyê li desthilatdaran teng dike, dibin hedefa êrîşan. Desthilatdar xwezayê talan û wêran dikin. Nexweşxaneyan bombe dikin. Daristanan dişewitînin. Birîndaran û xizmetkarên tenduristiyê qetil dikin. Nexweşxane cih û warên jiyandinê ne. Bijîşk û xizmetkarên tenduristiyê ji bo jiyandina mirovan sond xwarine. Ji bo bidin jiyandin şev û rojên xwe dikin yek. Li gorî xala 8'an a Peymana Cenevreyê ya di sala 1949'an de hat îmzekirin, êrîşa li dijî nexweşxane, xizmetkarên tenduristiyê, war û wargehên sivîl sûcê şer e.

Lê hêzên serdest ên ku erka wan alîkariya alav û amûrên tenduristiyê bidin nexweşxaneyan, dijberî vê yekê li ser nexweşxaneyan bombeyan dibarînin. Li gel ku sûcê şer dikin jî dewletên ev peyman îmze kirine temaşe dikin. Dibin şirîkê vî sûcî. Ji bo kesên tedawî dibin û kesên tên jiyandin nejîn, êrîşî nexweşxaneyan dikin û xizmetkarên tenduristiyê qetil dikin. Li welatên cîhanê û Kurdistanê gelek mînakên vê yekê hene.

Her roj bi milyonan sewalan qetil dikin û dikin qurbanên xwe. Ji bo keyfa xwe bi milyonan sewalan dikujin. Ji bo koşk, qesr û qonaxan ava bikin û li ber peravên deryayan bijîn daristanan dişewitînin. Bi şewata daristanan re bi milyonan zindiyan qetil dikin. Daristan pişikên cîhanê ne. Navendên paqijkirina hewayê ne. Wargehên jiyanê yên hezaran cureyên sewalan in. Lê bi şewitandina daristanê wargehên jiyanê tune dikin.

Hêzên serdest herî zêde êrîşî çavkaniyên jiyanê dikin. Hebûna xwe li ser tunebûnê ava dikin. Ew dizanin ku nikarin li cihê mirovên azad hebin serbest bijîn. Dizanin ku dema xweza azad be ew nikarin li gorî keyfa xwe bijîn. Dema mirov li geşedanên dawî yên cîhanê dinêre vî wêneyê ku hêzên desthilatdar kişandiye xweştir dibîne.

Di demên dawî de hêzên girêdayî Tirkiyeyê li Şengalê, yên girêdayî Îranê li Efrînê û yên girêdayî Rûsyayê jî li Idlibê nexweşxane bombe kirin. Di êrîşan de bi dehan kesan jiyana xwe ji dest dan û bi dehan kes jî birîndar bûn.




**Nexweşxaneyan bombe dikin**

Hêzên desthilatdar li Kurdistanê şer belav dike û jîndaran qetil dikin. Herî dawî balafirên şer ên Tirkiyeyê di 17'ê tebaxê de Nexweşxaneya Sikêniyê ya Şengalê bombe kirin. Balafirên şer di êrîşê de bijîşkeke jin, 3 xizmetkarên tenduristiyê û 4 kesên nexweş bi giştî 8 kes kuştin. Rojek beriya wê ango di 16'ê tebaxê de dîsa êrîşî maşîneyekê kirin. Di êrîşa hewayî de Fermandarê YPŞ'ê Seîd Hesen û biraziyê wî Îsa Xwedêda qetil kirin.

Di 13'ê hezîranê de komên girêdayî Îranê Nexweşxaneya Şîfaya Taybet a li Efrînê bombe kir. Di êrîşê de nêzî 13 kesan jiyana xwe ji dest dan û 27 kes jî birîndar bûn. Saziya Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyeyê aşkere kir ku mîlîtanên Îran piştgiriyê dide wan êrîş pêk anîne.

Balafirên TSK'ê di 17'ê Adara 2018'an de Nexweşxaneya Avrînê ya li Efrînê bombe kir. Herî kêm 15 sivîlan jiyana xwe ji dest dan. Ajansa nûçeyan a navneteweyî AFP û Saziya Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) jî ev yek piştrast kir.

Piştî ku gelek saziyên çapemeniyê ev êrîş bi navê 'deqeya dawî' dan, nerazîbûnên li dijî dewleta Tirkiyeyê zêde bûn. Artêşa tirk a dagirker li ser hesabê xwe yê twitterê daxuyanî û dîmenek weşand. Artêşa tirk îdia kir ku 'Bomberdûmankirina nexweşxaneyê ne rast e' lê bi dîmenên ku wê bi xwe par ve kiriye, xwe derewîn derdixe.

Di sala 2016'an de Amerîka li bajarê Kunduzê yê Afganistanê nexweşxane bombe kir. Di êrîşê de piranî bijîşk herî kêm 30 kesan jiyanên xwe ji dest dan û 37 kes birîndar bûn.

Di sala 2014'an de jî Nexweşxaneya Şehîdên Aksa ya Gazeyê bombe kirin. Herî kêm 4 kesan jiyana xwe ji dest dan. 50 kes jî birîndar bûn.

**War û qadên jiyanê dişewitînin**

Di meha dawî de li gelek bajar û welatan daristan şewitandin. Li navçeya Hozat a Dêrsim, li Navçeyên Çelê, Gever û Şemzînanê yên Colemêrgê, li Navçeya Elkê ya Şirnexê, li navçeyên Licê, Pasûrê yên Amedê, li Navçeya Mîdyat a Mêrdînê û Çewlîg yên Kurdistanê agir bi daristanê ket. Li aliyê Tirkiyeyê jî li navçeya Kozan a Edeneyê, navçeya Manavgat a Antalyayê, Bajarê Mugla jî di nav de li herêmên Deryaya Spî, Ege, Marmarayê agir bi daristanan ket. Li Tirkiyeyê û Kurdistanê bi giştî li 49 bajaran agir bi 299 daristanan ket. Di şewata daristanê de 8 mirovan jiyana xwe ji dest dan. Bi sedan hektar qadên daristanê tev şewitîn. Bi deh hezaran sewalên daristanê şewitîn û mirar bûn.

Li herêma Tirkiyeyê 15 balafirên vemirandina agir, 62 helîkopter, 9 balafirên bêmirov, 1 helîkoptera bêmirov, 850 arazoz û tankerên avê, 450 maşîneyên kar, 5 hezar û 250 personelên kar mudaxaleyî şewatê kirin. Lê di şewata daristanên Kurdistanê de welatiyên ku xwestin mudaxaleyî şewata daristanê bikin leşkeran destûr nedan û leşker bûn asteng.

Li gelek welatên cîhanê jî daristan şewitîn. Li Hindistan, Sibirya, Çîn, Malezya, Endonezya Avustralya, Îtalya, Yewnanistan, Arnavutluk, Romanya, Rûsya, Amerîka, Kanada, Amerîkaya Başûr daristan şewitîn.

# Azadiya bisînor û koletiya bêsînor

Feyzî Mîrhesen

Ez ê li ser têgehên azadî, bendewarî û koletiyê hin dîtinên xwe binîm ziman. Beriya ku em dest bi mijara xwe bikin bi gotineke 'Tu tişt ji azadî û serxwebûnê bi rûmettir nîne' em dest bi mijara xwe bikin. Gelo azadî û bendewarî çi ne? Beriya mijarê şer û aştiyê çi ne? Şer û aşitî du têgehên li dijî hev in. Her wisa azadî û koletî jî li dijî hev in. Lewre di azadiyê de biratî, wekhevî û xweşî heye. Lê di şer de mirin, talankirin, wêrankirin, hêsirên çavan û dijminahî heye. Azadî ew e ku mirov bikaribe, dîtin û ramanên xwe bêtirs û bêastengî bîne ziman. Di nav vê de, kesayeta neteweyî, ziman û hemû mafên mirovayiyê hene.

Lê ku mirov terîfa azadiyê bike û bîne ziman. Hin şert û mercên azadiyê jî hene. Gelo ma di azadiyê de jî sînorek heya an na? Kes, civak an jî desthilatdar dibêjin: "Na azadî bê sînor e. Em di sînorê xwe de li ser navê bawerî, demokrasî an jî azadiyê dikarin her tiştî bikin û kes nikare ji me hisab bipirse." Ev azadî şaş e, lewre mirov nikare amûran li gorî xwe şirove bike û bi kar bîne. Azadî ew e ku mafê xwe yên mirovî, neteweyî bi kar bîne. Lê nekevin an jî nekeve sînor û hidûdê kesên din. Ji wan kes û civakan re rêz û îhtiramê bigire. Wê gavê ew kes an jî civak azad in û li gorî mafên mirovahiyê tev digerin.

Koletî jî ew e ku kes nikare mafên xwe yên mirovahiyê bi kar bîne û azadîya wî/wê di destê kes an jî desthilatdariyeke din de ye. Serdestên wan çiqas destûrê bidin ewqas dikarin mafên xwe yên mirovî, çandî û baweriyê bi kar bînin. Di warên neteweyî û mirovahiyê de em kurd di vê rewşê de ne. Lê di rewşa civaka miovahî, cudayiya koledariya dema berê û îro de, di navbera çînan de ferq hene. Gelo ferq çi ne?

Berê kole dixebitandin û zikê wan têr dikirin. Koletiya wan ne ji bona ku kurd, ereb û nijadeke din bûn. Bawerî û dirûvên wan ne pirsgirêk bûn, bi tenê keda wan dixwarin. Lê îro kesek dikare bibêje heyran îro fabrîqe û kar heye, em di keda xwe de azad in. Wesayît û avahiyên me hene. Rast e li gorî koledariya berê lê? Gelo dikarin bêyî xwediyê fabrîqeyê bibêjin em naxebitin mafên xwe dixwazin. An jî fabrîqeya ku tê de kar dikin, xwediyê fabrîqeyê, fabrîqeyê bide kesekî din dê karker çi bikin. Carna karker û fabrîqeyê bi hev re difiroşin kesekî din. Ev pergal bibêje hûn li gorî me baweriya xwe bi rê ve bibin. An jî em ê we ji melatî û berpirsyariya saziyên we diavêjin. Hûn ê fetwa hela û heramiyê li gorî me bidin. Kesên zalim weke mezlûm, kesên mezlûm û bindestan jî wekî zalim nîşan bidin. Bibêjin gelî dadger û hakiman kesên mafxwaz bigirin ên zordest azad bikin û berdin. Siyasetmedar û parlamenter, kesên ku wekî me nefikirin ciyê wan li cem me nîne. Gelo kî bibêjin na. Elbet gotina me jî kesên xwedî wijdan û bişeref re nîne. Kesên di rêya Hz. Îbrahîm de dimeşin pir in. Lê diavêjin ar û agiran. Koçber dikin. Talan dikin û wan ji axa wan dertînin. Em dipirsin. Ey gelî canik û camêran! Hûn biryar bidin, azadî û koletî çi ne? Di warê maf û netewetiyê de rewşa me kurdan li ber çavan e. Lê ya civak û mirovatiyê çi ye? Ji bo ku kurd nebin xwedî mafê azadiyê, ew hemû maf ji destê wan tê girtin. Dixwazin tevan bêdeng bikin.



Lê ji bo me kurdan ne tenê di aliyê raman û kedê de, di aliyê ziman, çand û hebûnê de hemû mafên civaka me ji destê me hatiye girtin û tê înkarkirin. Dibêjin ziman û çandeke wiha nîne. Keseke/î hebûna wê/î qedexe be, ked û baweriya wî her wiha hemû mafên wî yê mirovatiyê jî nîne. Wekî mînak melayekî temenê wî heftê salî ji ber mewlûda kurdî xwendibû avêtin zindanê û jiyana xwe ji dest da.

Ji bo wî seydayî kîjan azadî?

# Texlîyakerdeneya ferz nêame kerdene

Bado ke Afganîstan hetê Talîbanî ra ame dagirkerdene ra nata 18 hezarî ra zêde merdimî bi rayîrê hewayî koç kerd. Çapemenîya rojawanî dîyar kerd ke vera DYAyî de rexne zêdîyayî û her çiqas ke teyareyê DYAyî bibî zî texlîyaya qîmkerde nîna viraştene

Talîbanî bado ke xeylê bajar û qezayan vist binê kontrolê xo, rayraberdişê xo îlan kerd û eşkera kerd ke do welat pê rayraberdişê şerîatî bêro rayraberdene. Talîbanî peynîya hezîrane de berê sînorî yê Şîr Han Bedereyî yê Tacîkîstanî zî vistbî dest ke têkilîyê ekonomîkî ê înan hêz bibo. Goreyê malumatanê ke selahîyetdaranê NATOyî da Reutersî, badê dagirkerdişê paytextê Afganîstanî ê Talîbanî Kabul de 18 hezarî ra zêde kesî bi rayîrê hewayî mecbur mende ke koç bikerê. Na çarçewa de nizdîbîyayîşê vera krîzî ê rojawanî ame rexnekerdene û dîya zanayene ke DYA sozê hewldayîşê texlîyakerdişî dayo.

Xebere de ame vatene ke Talîban vato merdimê ke belgeye înan ê gêrayîşî çinîyo wa agêrî keyeyanê xo, la reyna zî welat de bi hezar merdimî seba remayîşî teyaregehan dekerdî.



**Teyare esto la texlîya çinî ya**

Goreyê xebera ke Associated Pressî (AP) de vejîya, DYA seba texlîyakerdişa amerîkayij û afgananê ke Teyaregehê Kabulî de yî, mîyanê hewldayîşan de yo. Her çiqas ke 31ê tebaxe nizdî bibo zî bi hezaran merdim paweno ke bi rayîrê hewayî welat ra biremî.

Goreyê eşkerayîya ke Verfekê Wezîrîya Teberî yê DYAyî Ned Prîce da, roja panşeme 6 hezar merdim texlîya bîyî û yeno pawitene ke saetanê vernî de pê teyareyanê leşkerî texlîyakerdişê bi hezaran merdiman virazîyo. Verfekê Pentagonî John Kirbyî da zanayene ke 2 rojanê peyênan de 2 hezar rayvanî firayî. Kirbyî dîyar kerd ke teyareyê artêşa DYAyî estê ke roje de mabenê 5 hezar û 9 hezaran de merdiman texlîya bikerê, la heta roja panşeme hîna tay texlîyayî resayî teyaregeh.

Goreyê xebera ke United Press Înternationalî de ca girewt, Serekê DYAyî Joe Biden vato ke seba asayîşê hemwelatîyanê amerîkayijan do artêşa DYAyî ra grubêka şenik heta 31ê tebaxe Afganîstan de bimana.

Parlementoya DYA ra Mitch McConnell û Kevin McCarthy dîyar kerdî ke ganî derheqê Afganîstanî de malumatê hîna bi detay bidîyo. ***ANQARA***

# Vera qedexeyan nêrazîbîyayîşî zêdîyenê

Walîtîya Dêrsimî bi bahaneyê janê Korona her menge de çalakî û aktîvîteyan newera qedexe kena. Şar vera nê qedexeyan nêrazîbîyayîş û reaksîyonanê xo mojneno. Derheqê babete de temsîlkaranê dezgehanê Dêrsimî qisey kerdî û waştî ke wa qedexe bêro wedaritene.

Hemserekê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Dêrsimî Îbarahîm Kasunî vist vîrî ke nêzdê yew serre yo ke Dêrsim de aktîvîte û çalakîyî qedexe yê û vat: ''No qerarê qedexeyî ke Walîtîya Dêrsimî girewto îqtîdarê faşîstî yê AKP-MHPyî ra xoser nêyo. Wazenê tîya vengê muxalefetê demokratîkî bibirnê û polîtîkayanê xo bîyarê ca. Seba ke vera nayî nêro vejîyayeye çalakîyan û aktîvîteyan qedexe kenê. Ma sey partîyanê sîyasîyan û dezgehanê komelê sîvîlî nê qedexeyan qebul nêkenê.''

Hemserekê Komeleya Elewîyê Demokratîke (DAD) Musa Kuluyî zî qiseykerdişê xo de vat: ''Îqtîdar welat açarnayo hepisxane. Heme dîn û kulturî ê bînan qedexe û înkar kerdî. Dêrsim pê bawerî, ziwan û kulturê xo cayêko xoser o. Coka her îdarekaro ke yeno tîya taybet o. Seba ke vengo muxalîfo ke tîya ra vejîyeno Tirkîya û dinya meeşnawê qedexeyan anê. No têna qedexeyê walîtîye nêyo. Walî pê nê qerarî hetê huqûqî ra sûc keno.''

Hemserekê Sendîkaya Kedkaranê Xizmetê Sosyal û Weşîye (SES) yê Dêrsimî Kahraman Yurukî zî qerarê qedexeyî sey qerarêkê keyfî name kerd û vat: ''Bi bahaneyê janê Korona wazenê vengê muxaleftî bibirnê. Jan têna çalakîyan de vila nêbeno, no qerar raşt nêyo. Walîtîya Dêrsimî ganî cade na xeletî ra agêra.''

Hemserekê Partîya Kede (EMEP) yê Dêrsimî Ergîn Tekîn zî vat: ''Hetêkî ra çalakî û aktîvîteyî yenê qedexekerdene hetê bînî ra îqtîdar kongre û mîtîngan keno. Eslê xo de pê nê qedexeyan wazenê vengê hetê muxalîfî bibirnê.'' ***DÊRSIM***




# Alegorîya edebî

Baha Akhan

*Ez eslê xo ra kurmanc a, la belê ez zaf wazena kirmanckî bimusa. No nuşte nuşteyê mi yê yewine yê kirmanckî yo. Ez do xîret bikera ke xebatê mi dewam bikerê. Ez edîtorê kirmanckî yê Rojnameyê Xwebûnî Nevîn Alkane ra zaf spas kena ke aye ez teşwîqê nuştişê kirmanckî kerda.*

Alegorî çekuyêka yewnanî ya. Na çekuye ziwanê fransî ra vilayê dinya bîya. Ma eşkenê maneya aye ya ferhenge wina tarîf bikerê: Bi rayîrê xeyal û sembolan îfadekerdişê fikir, têgêrayîş, hîs, zihnîyet û çîyanê bînan a. Alegorîya edebî zî sey tewirêka vatişî ya ke mîyan de şexs, kerdox, feraset û hedîse zafane bi şeklê edetî û eşkera nê, belkî mîyan de şexs, feraset û xeylê hedîseyê diyîne yê vatişî bi şeklê nimite ameya şîrovekerdiş. Coka alegorîya edebî wayîrê di duştê cîyayan a: Duştê teberî û xomîyan.


Maurren Qulligan berhemê xo yê bi nameyê *Ziwanê Alegorîyê* de na çekuye ser de hîra vindene û xîret kena ke na têgeh dêsman ser o bi ca bika. Qulligan sere de ferqê mabenê 'şîroveya alegorîk' û 'edebîyatê alegorîk' de mojnena. Aye gore; gama ke merdim yew metnê edebî çerçoweya alegorîk de girewt dest, yanî gama ke merdim şîroveyêk alegorî kena, o metin hem hetê teberî hem zî hetê xomîyanî de wayîrê daraxê meneyan a û nê maneyî zî bi şekilê tîkane xo gore sazkerdişêk hîyerarşîk rêz kena. Gama ke merdim çîyêk wina keno, o wext maneya teberî yena bêqîmetkerdene û merdim na maneya teberî êna duştê teferuatêk ke do ma bibero na maneya esasî ser, ya dêsman de nimiteyî. Tîya de êdî metin sey fenomenêkî ke mane eşkera kena nê, la sey fenomenêk ke maneya ci nimnena veto meydan.

Alegorî bi taybetî romanan de vêşî ameya xebitnayene. Sebebê no tarîxçeyê romane reyde eleqedar o. Eke ma Don Quîxotî sey romanê yewine qebul bikerê û qise bikerê, o wext ma do bi asanî bieşkê bivajê ke Don Quîxot ra heta na roje alegorî romanan de ameya xebitnayene. Atmosfera karnavalesk ya romanan de alegorîya edebî vejîyayo meydan. Kerd ke alegorîya edebî goreyê dewr û cîhanan (Frederîc Jameson dinya sey hîrê parçeyan parçe kerdibî: Dinyaya yewine ya kapîtalîst, dinyaya diyîne ya sosyalîst û dinyaya hîreyîne ya ameya kolonîzekerdene) xo raver biba.

Gama ke merdim alegorî sey tewirê edebî bivîno û ferqanê mîyanê berhemanê alegorîk û ê bînan dîyar bikero, o wext merdim do bivîno ke maneyê metnanê alegorîk sey darax ameyê rêzkerdene. Nêke aye bi rayîrê çeku, riste û cumleyanê mîyanê nê metnan de ameya weçînayîş, mane bi şeklêk yaverde xo dana sazkerdiş. Çimkî mîyanê nê maneyan de mesafeyêk hîyerarşîk çin a. Wendoxê bi şeklêk hemwext metinî ra fehm kenê. Êdî wendox seba qezenckerdişê maneya xomîyanî, zewqê wendişî, nêkenê qurbanî. Nê metinan de mane xo xorî de nênimnenê, çekuyanê metinî de eşkera yê. La belê ganî wendoxî uca de xebitnayişê no ziwanî de dîqet bikerê.

Sebebê ci no yo: Tewirê alegorîk de hesasîyetê wendoxan ê seba ziwan sey sebebê tewr bitesîr veto meydan. Merdim uca de eşkeno bivajo; nuqtaya ke tewirê alegorîk ê tewirê bînî cîya kenê, ziwan û xebatnayîşê ziwan bi xo yê. Bêguman retorîk û ziwanlêlî nê eseran de zî no fikrê îspat kenê.

Coka alegorî bi raştwendişê wendoxan ê metinî ra eleqedar benê. No tewir de wendox merkez de yo. Yanî no tewirê edebî tewirêk wendoxmerkezî yo. Seba aye Qulligan sey merdimanê normal nêewnêna wendoxan. Aye gore; o/a wendox sey kerdoxêk ke ziwan xeliqneno/a û sey kerdoxêk ke hetê ziwan ra ameyo/a xeliqnayene veto/a meydan.




# Meclîsê Medyaya Dîjîtal a Kurdîstanî ame ronayene

Merkezê Xeberan

Kurdî û dostê înan ê ke medyaya dîjîtale de ameyî têhet seba ke hêrişê dagirkerî, qirkerdiş û binpaykerdişê heqan ê vera kurdan dinya rê bidê eşnawitene û bikerê rojdem, Meclîsê Medyaya Dîjîtal a Kurdîstanî îlan kerd.

Meclîsê Medyaya Dîjîtal a Kurdîstanî ke bi eşkerayîyêke ronayîşê xo da eşnawitene ard ziwan ke înan têkoşînê azadîye de mewzîyêka newî înşa kerde û vat: ''Ma do heme platformanê medyaya dîjîtale de têkoşînê azadîye de vera faşîzmî û kolonyalîzma dagirkerdene kanalêkê neweyî yê têkoşînî a bikerê. Ma do waştişê cuya azade ya bi statuyî yê şarê kurdî bi vengê berzî bîyarê ziwan. Meclîsê ma sîmgeyê yewbîyayîşê şaranê Rojhelatê Mîyanên o. Têgêrayîşê Azadîye yo ke bi des serran o vera kolonyalîzmî û faşîzmî şer keno, ma vengê ci yê medyaya dîjîtale yê. Têkoşîno ke semedê azadîya Vakur, Başûr û Rojhilatî yeno dayene ma vervatoxê ci yê medyaya dîjîtale yê. Şorişê Rojawanî û paradîgmaya Rayberê Şaran Abdullah Ocalanî do rayîrê meclîsê ma roşn bikero û hêz bido ma. Meclîsê ma vera şîdet û tecawuzî yê vera cinîyan adresê têkoşînî yê medyaya dîjîtale yo. Ma do pîya bi heme şaranê dinya yê ke vera neheqîye sere wedaranê têkoşîn bikerê û pirdêko xurt ê paştdayîşî înşa bikerê. Kam ke wazeno medyaya dîjîtale biaçarno platformê xoverdayîşî wa meclîs de cayê xo bigîro.''



## Diya min jî wêjevan e

Di rêya gund de, wesayita wêjevanekî navdar, avê dikelîne.

Zilam erebeya xwe dide qeraxê rê û dadikeve, li der û dora xwe dinihêre, dibîne ku wa ye şivanekî li wê derê li ber pez e. Şivan li bilûrê dixe û pezên wî jî li der û dora wî direqisin, zilam bang li şivan dike.

Şivan tê gel wî û dibêje fermo, ez ê çawa alîkariya te bikim? Zilam dibêje tu karibî ji min re hinekî avê bînî baş e, şivan diçe jê re avê tîne û tê.

Wêjevan avê ji şivan distîne û bera radyetorê erebeya xwe dide û disekine.

Wêjevan ji şivan dipirse, ev pez yên tene ya na ? Şivan dibêje na, bi tenê ez şivan im û axaftina xwe didomîne, keko tu çi karî dikî ?

Zilam dibêje ez wêjevan im! Şivan wêjevaniyê wekî ku mirov ard biwêje anku (bêjing bike) fêm dike û weha dibêje: "Wîîî welehî diya min jî wêjevaneke gelekî jêhatî ye!"

***Riza Uyar***



## Tiştanok (mamik)



**1-**Tiştek min heye
Ez çûme şikefteke tijî kopal
Yek wisa nebû bidime pal
Gelo ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Diçe çiyê deng dide
Tê malê zeng dide
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**

**1-** Stirhê biziné, şaxê biziné **2-** Bivir, dasa daran

## Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya hertim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Beran û beraz di malê de**
**Min beran xwar beraz ma di malê de**


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Bivirê badayî**
**Di qula mar de mayî**

→ Heke ew jî nebû dê sedî sed ev çêbibe:
**Bide nanê xwe**
**Berde canê xwe**

***Çavkanî: Zûgotinok***
***Berhevkar: Mihemedê Kurdo***



## XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Cemidî 3. Birêveçûn 5. Destpêk 6. Xerîbî
7. Dilxweş 9. Kesên ku xwediyê ramaneke erênî ne
12. Hal 14. Cihê ku genim lê tê hêran
16. Navçeyeke Amedê 17. Cînavkeke nîşandanê ya nêz
18. Rojeke hefteyê
22. Kêfxweşî

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Hejmarek
2. Derewîn
3. Sewaleke ku ji bo goşt û hiriyê tê xwedîkirin
4. Bextewar
5. Darê qalind yê ku beştan radigire
7. Pîrozbahiya beriya dawetê
10. Ezman
11. Dahênan
13. Serxweşî
14. Karê kesên ku aşan dixebitînin
16. Bi çêj
19. Hesnê ku li simê hespan didin
20. Xemla çavên jinan
21. Notayeke mûzîkê
23. Agir

Bersiva hefteya borî



# Gula Reş û efsûna axa Xelfetî

Bêrîvan Karatorak

Her rengekî xwezayê xwedî wateyekê ye. Her rengek bûye sembola hin hest û derûniyan. Hin ji wan dilê mirov geş dikin, germ dikin, aramiyê didin û dibin sedema xweşiya derûniya mirov.

Reş… Rengê şînê, matemê û xemgîniyê… Her wiha rengê torinî û jixwebaweriyê ye. Li erdnîgariyeke qedîm, rengekî esîl neqişiye li ser guleke xwedî çîrokeke qedîm. Her nebat, giha û gulek xwedî rengek e. Yek ji van gulan jî 'Gula Reş' e. Gula Reş taybetiyeke herêma Xalfetiyê ye.

Erdnîgariya Kurdistanê bi taybetiyên cur bi cur xemiliye. Her taybetiyeke welêt dibe rengek û rengîn dike keskesorê. Kurdistan serbilindtir dibe bi dewlemendiya çanda xwe. Bala her kesî dikişîne ser xwe wekî serkêşeke govendê.

Her bajarekî welêt rengekî xwe li ba dike li ber pêlên bayê bihara Kurdistanê. Hênkahiya çemên ji berfên çiyayên Kurdistanê heliyayî bêhna mirov fireh dike. Nebatên siruştê tên civata welatiyan, ba stranan difîte, xweza tabloya xwe ya biharê xêz dike, welatî dikevin temaşeyê û dilê wan geş dibe.

Helbet wekî her herêmeke Kurdistanê herêma Rihayê jî xwe ji taybetiyên erdnîgariyê paşde nahêle û berê gelê kurd dide xwe. Bi taybetî jî efsûneke navçeya Xalfetiyê heye ku kulîlka li wê derê şîn dibe li tu deverên din şîn nabe. Li tevahiya cîhanê tenê li Xalfetiyê Gula Reş şîn dibe. Heke şitlên wê bibirin û li devereke din biçînin jî gul ne bi rengê reş, lê belê bi rengê sor vedike.

Taybetiyeke ku dev ji xwezaya xwe bernade, pê ve girêdayî û dilsoz. Her çiqas gelek caran çandina gula reş li hin bajarên din hatibe ceribandin jî bi ser neketine û gula reş li ser axeke din bi rengê sor vebûye.

Hêj sedema vekirina gula reş a li Xalfetiyê nehatiye zelalkirin. Di der barê vê yekê de tu daneyên zanistî tune ne. Lê belê tê texmînkirin ku ji ber avhewaya Xalfetiyê hinekî ber vekiriye û avhewayeke nerm lê heye, Gula Reş li wir şîn dibe.

Dibe ku Gula Reş henûniya xwe ji aramiya navçeyê jî wergirtibe. Di nava dîrokeke qedîm de xwezayeke afrîner dibişire.

Her çiqas Gula Reş di nav cureyên gulan de were pênasekirin jî hin cudahiyên wê hene. Gula dilsoz ne bi qasî gulên din bilind e. Her wiha jî wan emir dirêjtir e. Guleke reş biqasî sê salan zindî dimîne. Heta heke baş were xwedîkirin dibe ku heta pênc salan jî zindî bimîne.

Piştî ku tovên Gula Reş dikevin bin axê divê mirov gelek avê bide wan. Piştî ku hêdî hêdî şitlên wan şîn bûn divê cihê wan zêde neyê guhertin. Heta car caran divê mirov qet cihê wan neguherîne.

Di mehên biharê de ango nîsan û gulanê de gulên reş dibişkivin. Dibe ku ji ber avhewayê be ku rojê du caran mirov dikare gulên reş bibire. Danên hênik ên sibehê û êvarê gulên reş tên birîn. Her wiha ji ber ku qayîm in heta destpêka zivistanê jî gul vedidin şitlên darên gulên reş.

Gula Reş li gor gulên din li xwe zêdetir bikin jî ji rengên din ên gulan deregtir dibişkivin.

Bi bayê hênik bêhna newaze ya gula reş belav dibe li herêmê. Bêhneke ew qas xweser e ku tenê li erdnîgariya xwe nahewe. Berê xwe dide hin bajar û welatên din jî û li her derî balê dikişîne ser xwe. Gelek welat bi dû bêhna Gula Reş ketine ku tovên Gula Reş li axa xwe biçînin. Lê belê Gula Reş tu caran terka welatê xwe nekiriye û li ser axeke din venebûye.



Rastiya wê her çiqas nehatibe piştrastkirin jî di der barê gula reş de çîrokeke efsûnî heye. Li gorî çîrokê, li Xalfetiya dîrokî ku di roja me de piraniya wê di bin bendavê de hatiye hiştin, berî zayînê qraltiyek hebûye. Di wan serdeman de keça hosteyekî ermen a bi navê Vartuhî heye. Vartuhî bi zimanê ermenan tê wateya gul. Vartuhî di bexçeyê xwe de gulên sor xwedî dike û tim guh dide wan. Di heman demê de li bajêr xortekî bi navê Firat hebûye û ew jî kevokan xwedî dike. Firatê bêkes ji kevokan malbatekê çêdike ji xwe re. Sebra Vartuhî bi gulên sor tê û ya Firat jî bi kevokan tê.

Rojekê kevokên Firat direvin û diçin bexçeyê Vartuhî, Firat jî li dû wan… Ciwan li wê derê hev nas dikin û dil dikevin hev. Dem derbas dibe û her du ciwan dixwazin bizewicin lê hosteyê ermen ango bavê keçikê destûr nade ku her du ciwan bi hev re bizewicin. Keç û xortê dildar biryar didin ku birevin, lê haya hoste ji vê yekê çêdibe û dike ku derdora wan were pêçan. Wî wextî her du dildar fêm dikin ku êdî bi tu awayî nagihin hev û ciwanên evîndar xwe berdidin nava çemê hênik û dawî li jiyana xwe tînin. Ji wê rojê û şûnde gulên bexçeyê Vartuhî û hemû gulên sor ên Xalfetî rengê xwe vediguherin rengê reş. Li gor rîwayetan ji wê rojê ve gulên reş li Xalfetiyê şîn dibin.

Her çiqas rastiya vê çîrokê neyê zanîn jî aniha tenê rastiyek heye ku Gula Reş konê xwe vedaye di nav rengên welat de. Navdar bûye li Kurdistanê û bûye taybetiyeke xweser.

Piştî ku hatiye dîtin Gula Reş li tu deveran şîn nabe welatiyan xwestiye berhemên wê bigihînin bajarên din ên Kurdistanê. Her çiqas serdêrên Gula Reş nikaribin gulê bi xwe re bibin jî qet nebe berhemên wê bi xwe re dibin bajarên din. Hin kes rîçala wê dibin, hin kes loqûmên wê û hin kes jî sabûnên wê dibin. Li gel bêhna xwe ya newaze wekî tamekê jî dilê hezkiriyên xwe xweş dike.

Bêhn û rengê bêhempa yê Gula Reş û çîroka wê ya efsûnî ji dîrokê gihaştiye heta roja me. Bi heman dilsoziya xwe berê xwe dide pêşerojê û mestkirina nifşên nû. Di nav senfoniya rengên welat de bi toriniya xwe cihê xwe digire û strana çanda kurdan distrê.



## Hêvî û bêriya bêrîvanên bêzozan

Lezgin Akdeniz/ Bilal Gezer

Li gundê Mêlêsiyê yê navçeya Elkê ya Şirnexê bi sedan sal in bêrîvan bi hilhatina rojê re berê xwe didin zozanan. Lê di çend salên dawî de ji ber qedexeyan nikarin biçin zozanan. Bêrîvan tevî hemû astengî û qedexeyan dîsa jî dest ji bêriya xwe bernadin û pezê xwe li bilindahiya gundê xwe didoşin.

Dengê bêrîvanan jî çiyayî ye. Stran wekî stara wan e. Dengê wan wek aveke zelal diherike. Weke ku bi stranên xwe gazî pezên xwe dikin.

Bêriya wan hevpar e. Bi hev re keriyên pez didin bêrî. Bi hevre didoşin. Her yek ji wan çawa pezê xwe nas dikin pezê wan jî wan wisa nas dikin. Di navbera wan de hevaltiyeke jidilûcan heye.

Bêrîvan, piştî roj diçe ava xatirê xwe ji pezê xwe dixwazin û bi bêrîkirina ku rojekê biçin zozanên xwe berê xwe didin gund û dikevin rêya gund. Her bi vê hêvî û baweriyê diçin û tên.

# Di çanda kurdan de tevn

Kurd ji ber bi sewalkarî û cotkariyê mijûl dibin çanda wan a vê qadê pir dewlemend e. Di nava kurdan de karê cotkarî û sewalkariyê pir pîroz e. Her ku kurd bi axê û sewalkariyê re bûne yek bêtir afirandine û çandeke qedîm li pey xwe hiştine. Ji ber berhemên axê û sewalan çandek ava kiriye. Kurdên debara xwe bi sewalkariyê dikin, ji berhemên wekî şîr, mû, hiriyê çandek ava kirine. Ji şîr çanda penêr, mast, lorikê, ji mû, çanda kon, tej û merş/berikan ava kirine. Ji hiriyê jî çanda balgî, lihêf, doşek, kulav û gelek berhemên din ava kirine. Bi taybetî kurdên sewalkariyê dikin û li zozanan dijîn çanda tevnê cihekî taybet digire.


Ji bo ku berhemên sewalan biparêzin û jê sûdê bigirin amûr û alavên hilberîneriyê ava kirine. Yek ji van amûrên hilberînê jî tev ne. Çanda ku kaniya xwe ji sewalkariyê digire bêtir bi destê jinan hatiye parastin û pêşxistin. Çanda tevnê bi huner û hezkirina jinan pêş ketiye. Jin ji bo tevnekê li dar bixin, divê berhemê salekê kom bikin. Ji bo vê jî salekê bi sebr amûran kom dikin, reng û rû didin wê hunerê.

Ji bo ji mû û hiriya pez û bizinan sûdê bigirin, divê bi teşiyê birêsin, bikin gilok. Tevnê li dar bixin û gilokên ta û dezî bikin tej, merş, bermal, kon û berhemên din. Ji bo tevn bê li darxistin, pêdivî bi havo, firtê, rino, kerkît, befş, masûr, hepik, şehê hiriyê, teşî, hirî, liba, sêpê, stûn û pîj heye. Ji berhemên tevnê çewal, têr, xwircik, gorê rîs, kap, kulav û bermal tê afirandin.



Tevn, dezgehê veçinandinê ye. Hevo, benê ku di tevnê de berwarkî tê avêtin. Firêd, ji benê du tayî re tê gotin. Rino, şeyê tevnê yê ji dar hatiye çêkirin. Kerkît, ew amûrê ku di dema veçinandinê de ji bo ku ta nêzîkê hev dikin. Ji hesin hatiye çêkirin. Befş, textikê ku bi masûr di navbera tayên tevnê re derbas dibe û tayikan ji hev vedike ye. Masûr, ji mekîka tevnê re tê gotin. Hepik, amûrê ku di dema veçinandinê de ji bo ku tayikan nêzî hev dike. Şehê hiriyê; amûrê ku ji bo hirî were ristin pêşî hirî pê tê şekirên. Teşî amûra ku pê rîs tê ristin û dibe benik/ta. Hirî, pirça mihan e. Liba, pirça berxikan e. Çewal, cem/cemik jî têne gotin. Ji tayê hiriyê çêdibe. Têr, mînanî çewalan tê veçinandin, du cemik bi hev ve têne dirûtin, diavêjin ser pişta ker û hespan. Xalîçe,di serî de hirî tê ristin û dibe rîs, ew rîs ba didin û dikin "firêd" yanî du ta. Piştre reng dikin û dixin telaş. Li tevnê dixin vedişêrin.

Çanda tevnê bêtir bi destê jinan hatiye parastin û heta îro hebûna xwe berdewam dike. ***AMED***




## Pirtûkên mehê

Navenda Nûçeyan

Pirtûka nivîskar û wergêr Samî Hêzil ya bi navê *Lehengê Mîtolojîyê* ji Weşanxaneya Lîsê derket. Hêzil xwestiye li taybetmendiyên lehengên nav destanên kurdî binêre û bi mînakên xwemalî hin encamên objektîf derxe holê.

Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di nav vê mehê de pirtûkeke bi navê *Destanên Me* ya ku ji 17 destanan pêk tê ji weşanxaneya Wardozê çapkirin. Di pirtûkê de destanên kurdan yên wekî Binefşa Narîn, Ker û Kulik, Derwêşê Evdî, Mencola Yaz-Begê, Telî Hemze, Xelîl Bego cih digirin.

Dîwana dawî ya helbestvan Berken Bereh, *Wisa Tê Bîra Min* ji nav weşanxaneya Avestayê hat çapkirin.

Her wiha dîwana helbestvan Yehya Omerî ya bi navê *Nêrgiza li Defterê Bişkivî* ji weşanxaneya Avesta hat çapkirin.

xwebûn

23-29 Tebax 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 88

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Yado: Teyrê çiyayên Kurdistanê



Ayhan Erkmen

*Dilo jaro bi Yado re xeberde,*
*Bila rabe mecala qewmê kurd e,*
*Were carek li kurdan em binhêrin,*
*Hemî xurt û piling û şêr û mêr in.*

Seydayê Cegerxwîn di destana xwe ya bi navê 'Şahnema Şehîdan' de wiha bangî 'teyrê çiyayên Kurdistanê YADO' dike.

Yado ango bi navê wî yê di nav gel de Yadîn Paşa di sala 1889'an de, li Dara Hênê ji dayik dibe. Ji eşîra Ziktêyan kurê Mehmûdê Ebas e. Dû re malbat ji Dara Hênê ji herêma ku bi navê eşîrê tê binavkirin koçber dibin tên û li navenda Çewlîgê cihwar dibin.

Di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Osmanî têk diçe û artêşa wê xwe nagihîne her derê. Artêşa rûsan devî devî Çewlîgê dibin. Kurd bi tesîra propagandaya ku 'ev derên bibin Ermenistan' dikevin nav liv û tevgerê. Şêx Şerîf yekîneyekê ava dike û li hemberî rûsan şer dike.Yado jî di nav yekîneya wî de cih digire. Li gorî salixdayînê leşker ji birçîna qir dibin, Yado diçe ku deriyê embarên rûsan veke, tê girtin. Lê jê re li hev tê dema ku leşker dikevin xewê ji destê wan direve û xwe xelas dike.

**Yado û serhildana 1925'an**

Kurd di wan salan de, bi bêhesabî canê xwe ji bo welatekî hevpar didin, lê di dawiya dawîn de tune tên hesibandin. Para bêbext û xapînokan; welat e, ji kurdan re jî serhildan û komkujî dikeve.

Ji ber vê bêbextiyê di sala 1924'an de li Erziromê di bin rêveberiya Xalit Begê Cibrî de Tevgera Azadiyê tê avakirin. Di reveberiyê de mebûsê Bedlîsê Yûsûf Ziya Beg, Îhsan Nûrî Paşa û giregirên kurdan cih digirin.

Lê haya dewletê zû ji vê tevgerê çêdibe û zû jî tevdigerin; pêşiyê Yûsûf Ziya Beg dû re Xalit Begê Cibrî digirin. Bar li ser milê Şêx Seîd dimîne. Ew jî bi peywirdarkirinê vî barî bi hevrêyên xwe re parve dike. Li gorî van peywiran Yado jî di bin fermandariya Şêx Şerîf de li eniya Çewlig û Xarpûtê ye.

Dema ku guleya ewilîn di 13'ê sibatê de li Pîranê diteqe, hêzên di bin serweriya Şêx Şerîf û Yado de tavilê Çapaxçûrê hildidin. Di 20'ê sibatê de, hema bêjin bê şer û dew, Palûyê dikin bin qontrola xwe. Piştî re berê xwe didin Xarpêtê, li vir gel her çiqas alîkariya hêzên kurdan neke jî bêdeng dimîne. Leşker çend cihan dikevin pevçûnê lê xwe li ber hêzên kurdan nagirin, şûnde vedikişin û bajar di 25'ê sibatê de dikeve bin destê hêzên kurdan. Şêx Şerîf û Yado li gundê Huseynîka ya Xarpêtê diçin serdana mebûsê Dêrsimê yê berê Hesen Xeyrî Beg û bi hev re ji serok eşîrên Dêrsimê re têlgrafekê dişînin û dibêjin: "Aram bin, em ê gav bi gav ber bi we ve jî bên, hûn jî li gorî wê tidarekên xwe bikin, serkeftin."

Mistefa Kemal bi tedbîr tevdigere, hikûmetê diguherîne serokwezîr Fethî Okyar ji pêywirê digire, Îsmet Înonû tîne dewsa wî û kesên herî devbixwîn peywirdar dike. Îsmet Înonû bi zagon û dadgehên taybet, şerekî taybet û derûnî dide meşandin. Ewilîn dixwaze piştgiriya gel qut bike û wan li hember hêzên kurdan bi kar bîne. Bi parçeyekî vê planê re, di cebilxaneya leşkerî de, ya ku ketiye bin destê hêzên kurdan teqîneke mezin dide çêkirin û di encamê de ji gel gelek kes tên kuştin, di nav bajêr de jî dikan tên şêlandin, tavilê hewa tê guhertin, ser binê dinyayê nav hev dikeve.



Dibe hêwirze, bêserîbûniyek çêdibe, hêzên kurdan nikarin pêşiya bûyerên xirab bigirin. Hêzên dewletê êrîş dikin, gelê heya wê gavê di bêdengiyê de ye radibe piştgiriya leşkeran û bajêr şûnve ji hêzên kurdan distînin. Hêzên kurdan heya geliyê Mendo dikişin û li vir zora wan dibin lê vê carê jî serokê eşîra şadiyan Necîp Axa tê hewariya leşkeran û di nav hêzên kurdan de ziyanên mezin rû didin.

Fermandarê hêzên kurdan Şêx Şerîf di 8'ê nîsanê de, li herêma Metonê tê girtin. Ev bûyera nebixêr pêvajoyê diguherîne. Pir nakşîne di 15'ê nîsanê de Şêx Seîd jî bi îxaneta Qasim nêzî Gimgimê tê girtin. Dadgeha Îstîqlalê bi darizandineke derewîn her du şêxan di 29'ê hezîranê de darve dike.

Yado jî nav de şeş yekîne li çiyayan serhildanê didomînin û li ber xwe didin. Dewlet ku pêkê nayîne, ji Xarpêtê, herêma Sîwanê, heya Tetwanê, 337 gundan dişewitîne. Di êrîşa gundê Ziktê de qasî 30 kal, pîr, jin û zarok xwe di şikeftekê de vedişêrin lê leşker cihê wan diyar dikin. Ber devê şikeftê bi qirş, qal û daran tijî dikin û agir berdidinê. Zarokeke keçik ji nav agir xwe davêje dervayî şikeftê lê dema ku lûleyên tivingan pêş çavên xwe dibîne, li agir dinêre li wan dinêre şûnve xwe diavêje nava agir.

**Ber bi sirgûniyê ve**

Gelê herêmê yên ji komkujiyan xilas bûne jî ji bo alîkariya şervanan nekin tên mişextkirin. Rabîa Xanima hevjîna Yado û kurê wî yê 5-6 salî Çerkez jî di nav de bi deh hezaran kes tên koçberkirin. Dema li Qeyseriyê leşker di perwerdeyê de gotina 'Yaşa yaşa Kemal Paşa' berz dikin Çerkezê biçûk jî bi tevî hevalên xwe dibêje 'Yaşa yaşa Yadîn Paşa.' Çendekî şûnde leşkerek bi şaşî lê dixe û Çerkezê kurê Yado dikuje.

Bi rastî jî ji pey mişextkirina gel şert û mercên jiyanê ji bo şervanan zehmet dibe. Bê civak û bê star li herêmê mayîn edî ne pêkan e. Ji bo zivistana sala 1927'an ewle derbas bikin Yado û hevalên xwe biryara koçkirina binxetê didin.

Bi tevî malbatan qasî 500 kes derdikevin rêwîtiyeke dûrûdirêj. Li çend cihan şer diqewime, dema li herêma Qerejdaxê xwe digihînin gundê Çelbiranê, gundî îxbar dikin û hêzeke leşkerî ya giran bi mîtralyoz û balafiran di ser wan de digirin.

Şervanên kurdan bi wî halê pêrîşan jî şerê xwe dikin û didomînin. Yado li vir bi tivingê, li balafirekê dixe, hê jî ji wê mintiqê re dibêjin 'Cihê ku Yado balafir xistiye.' Bi ketina balafirê re leşker çekên xwe dihêlin û direvin. Ew jî bi dû rêwitiya 12 rojan xwe digihînin binxetê ango Sûriyeyê. Sûriye, wê gavê di bin destê Fransayê de ye, ew serhildêrên kurdan ji hev diqetînin û cih dikin.

Yado li Sûriyeyê jî dest ji ber xwe hiltîne, betal nasekine, bi malbata Bedirxaniyan re nasîna wî çê dibe di nav xebatên Xoybûnê de cih digire. Di 5'ê cotmeha 1927'an de li Libnanê, bajarê Bhamdûnê, tev li kongreya 'Xoybûnê' dibe.

Lê Yado li wan deran pir nasekine, heduriya wî nayê, axa welêt gazî wî dike, xwe nagire derbasî bakur dibe. Di 24'ê cotmeha 1928'an de li Stewrê ser qereqolekê de digire, çekên wan berhev dike û şûnve derbasî Rojava dibe.

**Vegera bakurê Kurdistanê**

Di serê sala 1929'an de bi peywirdarkirina Xoybûnê, Yado bi yekîneyekê, ji Rojava derbasî Bakur dibe û ser Amedê re xwe digihînin herêma xwe, Yado digihîje mirazê xwe.

Herêmên Meton, Pûex û Sîwanê, çiyayên Heserekê, Ko Spî, Şerefdînê, çiya, çem û zozanên Çotela, Zozanên Kanîreşê, Daristanên Cehennema Siya û Mêrgemîrê bi dîtina Yado şa dibin, wî şa dikin.

Gund bi gund digere, hîn dibe ka gelo hela kî miriye û kî maye. Li herêma Depê li gundê Himanê dibe mêvanê Osman Axa, ala û belavokên Xoybûnê diyariyê wî dike.

Lê agahiyên digire kêfa wî dişikîne, ji dost û têkiliyên berê kes nemane, an hatine kuştin an girtin an jî hatine koçberkirin. Yên mayî jî nerindî û neyartiyê dikin. Ne bi tenê îxbar dikin çekê hildidin û li hember wan şer dikin. Dewlet bi alîkariya hevkarên xwe ji bo Yado bikişîne dafikê dest bi lîstikan dike.



Saîd Began ê ku Şêx Şerîf jî îxbar kiribû pêywirdar dikin, dişînin gel Yado. Bi Yado re li daristanên jora Kaniya Yado hevdîtinekê çedike. Jê re dibêje 'Ji xwe efû derketiye, were, teslîm bibe' Yado rasterast dibersivîne 'Ez ji te û dewleta te bawer nakim, hûn bêbext in.'

Hevjîna Yado ya biçûk Têlî Xanim, her du birayên wê Huseyn û Mehemed û pismamê wê Meh Evd jî tev li şervanên Yado bûne.

Têlî Xanim çekên leşkeriyê li xwe dike û çekê bêminnet bi kar tîne û ji mêran çêtir şer dike. Dest û piyê Yado ye, ji bo agahiyan bigire dadikeve gundan bi saya jinan agahiyan berhev dike kar û barê Yado sivik dike.

Di sala 1929'an de li Dara Hênê di nav aqara gundê Ûlyanê de şer diqewime, Têlî Xanim dema ku yê kozika xwe biguherîne tê birîndarkirin, gelek xwîn jê diçe û pir bêhal dikeve. Ji bo yekîneyê re nebe bargiranî ji Yado dixwaze ku bila wê bikujin û bêhêlin, naxwaze sax têkeve destê mîlîs û leşkeran.

*Têliya Zer, barê min giran e*
*Li ser pişta min, bar Kurdistan e,*
*Ez difirim li ser çiyan*
*Him payîz, havîn û zivistan**

Li gorî salixdayîna dengbêj Fesîhê Ehmedê Bertî destê Yado naçe ser lê ji ser xwesteka wê Meh Evd wasiyeta wê tîne cih û wê li herêma Selînceyê dispêrin axê. Lêşker cihê Têlî lê veşartine tê derdixin, gundî diçin wê tînin li gundê Ûlyanê vedişêrin.

**Efsûnên efsaneya Yado**

Yado lehengekî efsaneyî ye. Dema ku em li herêma wî li dû şopa wî ketin şêniyên herêmê, der barê wî de behsa gelek tişt û bûyerên efsaneyî û sirdar kirin. Kuştina Yado jî bi heman awayî tê neqilkirin. Der barê kuştina wî de jî rîwayetên cuda hene.

Li pey şerê Ûlyanê Yado, Meh Evd û yekîneya wî li Dara Hênê, li gundê Mistan dibin mêvanê Mûsayê Silêman. Dema ku ji gund vediqetin ji gundê Kaxkîkê Kel Telhe û Hecî Şukrî bi tevî cerda xwe li pêşiya wan kêmînê datînin. Şerekî bêeman çêdibe. Çend şervan tên kuştin, Yado û Meh Evd jî birîndar dibin. Yado Meh Evd bi zorê razî dike dibêje: 'Xwe di cihekî de veşêre, qet nebe bila ji me yek sax bimîne û tiştên hatine jiyîn neqil bike.' Fîşengên mayî hildide û bi tena serê xwe şer didomîne. Lê dema fîşeng xelas dibin ew jî tê kuştin. Li gorî salixdayînan serê wî jê dikin û ji bo mirovan bitirsînin nîşanî hin kesan didin. Lê tu kes ne ji rayedaran re dibêjin 'Ev serê Yado ye' ne jî ji kesî re dibêjin 'Me serê Yado dîtiye.'

Hin kes dibêjin ku Yado ji şerê Ûlyanê difilite di navbera Licê û Dara Hênê de, li mintiqeya 'Kevirê Bazdê' bi îxaneta Hecî Şukrî tê kuştin. Hecî Şukrî wî dixapîne jê re dibêje 'Tu li vir li benda me be em ê ji te re fîşengan û pêdiviyên te yên din bînin.' Lê kurê xwe dikuje xeberê dide leşkeran. Ew jî ji tavilê serda digirin, Yado heya ku ferq dike û dixwaze xwe biavêje daristanê, lê nagihîjê û tê kuştin. Li vî cihê ku Yado hatiye kuştin zinareke heye jê re dibêjin 'Kevirê Yado', sibetirê gundiyên Dereyê Reşî (Qiyameyê Reşî) termê Yado dibînin û dispêrin axê.

Li gorî ragihandina Mele Yûsûf Andan jî dema ku haja dewletê ji vegera Yado çêdibe leşker erd û ezman li dû şopa wî dikevin. Di adara 1929'an de di gundê Mezrê Kelo de pevçûn çêdibe. Di vî şerî de Têlî tê kuştin, Yado jî êvara rojê di gundikê Dizikê yê pişt şikefta Birqleynê de tê kuştin. Leşker bi şev vedikişin, gundî bi serê sibê re diçin cenazeyê Yado û Markoyê ermeniyê hevalê wî li wir vedişêrin.

Li gorî ragihandina şêniyên herêmê cihê gora Yado heya salên dawî jî diyar bûye lê dema rayedar dibînin ku ev der wek ziyaretgehê ye bi balafiran bombe-ran dikin.